

ŞAR

- REWŞA DERMAN LI HERÊMA CIZÎRÊ JI KIRÎZEK DEMKÎ BER BI PLANÊN DEMKÎ VE
- SERÊKANIYÊ, ÇAVKANIYA XABÛRÊ
- QETEK NANÊ HIŞK Û GURZEK GUL BIDIN MIN

5

2627

Naverok

RENGVEDANÊN PEVÇÛNÊ Û BANDORÊN WÊ YÎ CIVAKÎ Û ABORIYANE	01
RÊXISTINÊN CIVAKA SIVÎL LI QAMIŞLO	02
DIBISTANA PILINGÊN TAYKWENDO DIXWAZE XEWNAN BIKE RASTÎ	04
REWŞA DERMAN LI HERÊMA CIZÎRÊ JI KIRÎZEK DEMKÎ BER BI PLANÊN DEMKÎ VE	06
BES E	09
HEVPEYVÎN BI NIVÎSKAR Û WERGERVAN EBDELA ŞÊXO RE	10
SERÊKANIYÊ, ÇAVKANIYA XABÛRÊ	13
HOZANYARÎ DI NAVBERA XWEDANENASÎ Û OLDARIYÊ DE	16
LEŞKERÊN PAQIJYÊ	18
RÊYA TIRSÊ	20
RAZAYÎ- NERÎNEK DERZÎ	21
ALMODOVAR DERHÊNEREKÎ NAYÊ AVANYA ÇAVÊN TIJE HÊSIR Û MIROVÊN KELOGIRÎ	22
HANNAH ARENDT TUNDÛTIJYÊ ŞIROVE DIKE	24
ZAROK JÎ PENABER IN	25
QETEK NANÊ HIŞK Û GURZEK GUL BIDIN MIN	26

Mehane û çandî ye. Guh dide dozên hevjiyan û aştîya navxweyî, û karên sivil ên ku bi pevçûnê re tên.





Nivîskar berpîrs e di ber naveroka nivîs a xwe de, û Şar ji wê belav dike, ji ber ku pabend e

bi azadiya nerînê, ta ku ne li gorî siyaseta sernivîsê be jî.

Ji bo beşdarî, şandina pêşinyar, û pêwendiyê

info@shar-magazine.com

Mafên çap û belavkirinê parastine ji kovara ŞAR re

-  shar-magazine.com
-  info@shar-magazine.com
-  SharMagazine
-  SharMagazine

Ji weşanên rêxistina ŞAR a geşpêdanê



RENGVEDANÊN PEVÇÛNÊ Û BANDORÊN WÊ YÎ CIVAKÎ Û ABORIYANE

Pêkanîna diyardeyên civakî û aboriyane, yan veguhestinên ku li ser cureyên jiyana takekes û civakan çêdibe, demin dîdirên jê re divê, jixwe berî wê kombûn û sedemên vegotinan ew jî dibe ku di çarçoveya rewşên xwezayî de dehê salan bidome. Lê hebûna pevçûn û şer dihêle ku pêvajoya pêkanîna nîr û rewşên civakane yî nû ku tim girêdayî ye bi aboriyê ve, bi leztir bibe. Aboî ya ku girêdayî ye bi pevçûn û rêçên wê ve, her wisa bi netebitandina pîvanên hêzan ve di navbera aliyên pevçûner de. Ev diyarde û veguhezantînan han xwe di hundirê demin pîvankirî û encamin sûsret de, derdibire; û belkî seqet bin jî carinan. Û dibe ku ji encama vê rewşê ya ku –tekez- girêdayî ye bi mercin behanaçûnane ve di warên ewlehiyê yî curbicur de û di warê tenduristî û xwarinê de jî, dudiliyekê domane li cem ê welaî yan takekesekî li ser jiyana, çarenûs û malbata wî çêdike, ta ku ziyana şer bi rengê rasterast neghêje wî jî.

Şopînerê karûbarên civakî û jiyana, hebûna diyardeyên civakane yî pîs didît, mîna belavbûna hişbir, laşfirotin, xapandin, gendeliya diravî, reşwet, xwexurtkirin li ser civakê di rêya tîkiliyên bi aliyên ewlehiyane re û tiştin bed î dîtir ên ji rewşa stem û xwedesthilatkirinê (yên ku zemîneke baş bo geşkirina van nexweşiyên civakane peyda kir), derketin. Lê tiştê ku şerê heyî rû da cihê metirsî û karesetê ye, di heman rêça berê de ye, û bi rengê bêhtir. Hindek ji van nexweşiyên şeweyin nû ji xwe re dîtî û ji nû ve hate berhembirin li gorî pêdiviyên qonaxê û nîrên veguhestinê, bi şeweyin xuya yan veşartî. Hîn daxên salên stemê hene û dermankirina wan gellek hajêbûn û bêhinfirêhî jê re divê, ligel programin sivilane ku sînorê karêgeriya sererû derbas bike.

Dibe ku şewtandina qonaxan û derbaskirina gellek tiştên destnîşankirî, divê bibe da ku li bandora neiyî ji rotîne re haydar bin, her wisa bo bidestxistina nermbûnekê di kar û pêrabûnê de jî, di hundirê jingeha pevçûnê de, û ku dibe ev

derbaskirin handerekê li cem gellek kesên ku di vî işî de kar dikin, çêbike. Da ku nîrxê tiştê ku berê bi nîrx û buhaye bilind bike, û xwe ji ber zehmetiya kar nedin alî, ta ku derbaskirina wê bêçare xuya bibe jî; ji ber vîna pak ew bi xwe hêmana herî xuya ye bû serkeftina destpêkeriyên civakane yî rasteqîneyane û karêger.

Çaxa ku parên hewarçûnê û alîkariya pîjîşkî û nîxaftinê pêşkêşî pêdiveranan dibe, ger ligel programin geşpêdan û rahîname, û projeyin biçûk ku li gorî lêkolîn û rapirsînan avakirî be, dê rengvedanin neyinane li ser dema dirêj hebe. Ji ber ew xwespartin û alîkarîwestinê xurt dike, û wê xwesteka kar li cem pêdiveranan bide alî, û wê guhdanên wan tenê di benda parên xwarin û nîxaftin û xwedermankirinê de bimînin. Lewra divê aliyên daner karên xwe bêhtir bi nerînan rastîbinane bidin xuyan, her wisa bi komkirina kedên lêkolîn û tevlihevkirina nerînan û derxistina pêdiviyên rasteqîneyane yên ku bi lênerînek yekemîname bi tenê xuya diyar nabe.

Rêxistinên civaka sivil li Herêma Cizîrê, yên ku di hundirê jingeha pevçûnê de, bi lez û hêz, avabûn, dixuye ku cudaye ji rewşa pêgihîştinê û ji bîrdoziya pêdiviyên. Zorcaran karê ku jê tê xwestin: Derbasî mal û tax û zikakan bibe, hişyariyê belav bike, pêşkêşkirina xizmetguzarî û pîrkirinê di hundirê karê wê jî şênîyan re, û beşdar be di kêmkirina bandora şer û karesetên wê li ser jiyana mirovan. Û di heman demê de em qelsbûna derfetên ku ji pîrraniya van destpêkeriyên sivilane re pêşkêş dibin, dibînin, jixwe hindek çalakvan dibînin –di vê çarçoveyê de- ji qazîva hindek şeweyên tobawî ku ji rewşa heyî cuda ye, û dûbarekirî û jidervahatî ye didin pêş cêbecêkirina projeyin bi sîd û xwedî bandoreke rasterast li ser jiyana û paşeroja mirovan, lewra kar ji bo geşpêdanê û resnkirina ramana sivil bidûketin, ked û hewildanek domane dixwaze da ku (bikêmani) bi encamin qaylikirî derkevin. (Komîta Sernivîsê)



RÊXISTINÊN CIVAKA SIVÎL LI QAMIŞLO

Sîmav Hesên

Qamişlo, ev bajarê biçûk û zengîn bi pêkhatiyên xwe, ku Kurd, Ereb, Asûr û Suryan bi hev re lê dijîn. Berî ku bi têgeha hevjiyana aştiyane bibihîzin wan dizanibû çawa bikar binin, û dikaribûn hemû rengên aştiya navxweyî di nav xwe de peyda bikin. Ev têgeh a ku cara yekemîn ji aliyê serokê Hevgirtina Sofyatî "Nîkita Xrotşov" ve hate bikaranîn, û mebesta wî di wê demê de ew bû ji bo ku têkiliyên navdewletî bi şeweyekî aştiyane berdewam bikin, lê di vê demê de mebestê jê ew e ku tu bikaribî li nerînên kes ê li himberî xwe guhdar bikî, dûrî bingeha nijadperestiyê. Em dikarin bibêjin ku hevjiyana aştiyane şaxeke ji şaxên mirovahiyê ye, ev mirovahiya ku weke gellek tiştan winda ye di vê serdemê de. Piştî ku şoreşa Sûryayê dest pê kir û piştî ku rêxistinên civaka sivil hatin damezirandin, gellek ji van rêxistinên berê xwe dane karên

girêdayî bi mirovahiyê ve, her wiha hevjiyana hevbeş û aştiya navxweyî, ew yek bû ji giringtirîn karên ku ji bo wê xebat dest pê kirin, bi taybetî ji ber ku rêcîma Ba'is gellekî hewl dida ku kî û dijberiyê bixe navbera bere û pêkhatiyên herêmê de. Gellek çalakî, kampanya, kargeh (workşop) û ta bi festîvalan jî ji bo belavkirin û bikaranîna vê têgehê çêbûn. Şopînerên civaka sivil baş dizanin ku ev mijar bûye mijareke sereke, ku sazî û rêxistinên civakî li ser wan kar dikin, lê eger em hinekî di karê van rêxistinên de mijûl bibin, rola wan a balkêş û erênî di belavkirina têgehên mirovahiyê de, bêguman roleke mezin e, lê ta çi radeyê wan dikaribû van têgehên bixin warê pêkanîna de? Bi giştî gellek neyinî hene ji aliyê çalakiyan ve, weke mînak di workşopan de em dibînin ku mebest ne her dem xuya ye, û gellek ji kesên ku bi navê

rahêner tînan naskirin nikarin daxwaza xwe ji vê workşopê bi şeweyekî akadîmî bighînin kesên beşdar, ji ber ew bi xwe daxwazê ku bi zehmetî tînan pêkanînin, ne tenê wilo lê gellek caran dema ku pêkanîna workşopekê dikeve ser milê rahênerekî -bi taybetî di rêxistinên ku karên wan gellekî ne berbiçav e- em dibînin ku kesên ji malbat û hevalên xwe dide hev, tenê ji bo ku ev workşop bi rengekî rêxistinî xuya bike, û tenê çalakvanên bi nav û xuya di workşopên rêxistinên mezin de amade dibin, ev dibe pîrsgirêka sereke ku ev çand bi kesên navdar girêdayî ye û yan dighêjê kesên ku lê ne miqate ne. Her wiha weke tînan dizanin ku pîrriyên rêxistinên civaka sivil bi rêxistinên Ewropî ve girêdayî ne (ji hêla peredayîna ve), û berî ku ew pirojeyên xwe pêk binin ew li ser van pirojeyan kar dikin. Hin ji çalakvanên van rêxistinên xwe

li Turkiyayê perwerde dikin da ku karibin van pirojeyên xwe bi rengekî nû ji xelkê re pêşkêş bikin, û nayê veşartin ku bi hezarên dolaran li van workşopan didin, û di encamê de em dibînin ku ew tiştêkî gellekî biçûk ji millet re didin xuyanîkirin û pêşkêş dikin, ku ji biçûkbûna van pirojeyan ew xwarina xwe ya li otêlan li xwe helel nakin, û ne hew wilo lê bi navê dizan jî tînan naskirin, ji ber ku millet qezenceke diyar ji aliyê wan nabîne, û bi rastî eger tu rêxistinên civaka sivil bihejmêrî û tu berhevkirinê di nav hejmara wan û di nav wê sûda ku li millet kirine de (ji aliyê hevjiyana hevbeş di bin navê civaka sivil de), çêke, tînan encamê ne razî be. Xaleke din girêdayî bi çalakiyên van rêxistinên ew e -wek tînan- ku ew li dijî nejadperestiyê radiwestin, lê gellek caran ew ne serkeftî ne di belavkirina vê raman û nerînê de, wek mînak eger

rêxistinek bixwaze ku bide xuyanîkirin ku Qamişlo bi hemû pêkhatiyên xwe zengîn dibe, nabe ku ew di bin dirûşma biratiya gelan de filmekî pêşkêş bike ku tînan dide xuyanîkirin, berek bitena xwe xwedî maf e li vê herêmê; ew ne jêhatîbûneke ji cem min ku ez li ser vê xalê diaxivim, lê ev tişt di gellek çalakiyên civaka sivil de çêbûne, û bêguman ev filmê bi vî rengî -eger li ser Kurdan biaxive- wê bihêle ku ez weke miroveke Kurd kêfxweş bim lê pêkhatiyên din ê ku li vî filmî temaşe bikin wê bêhtir kîne ji min bikşînin. Tenê ev mînaeke biçûk bû di barê gellek şaştîyên bi vî rengî de. Ez bawerim ku mirov dikare di çalakiyekê bi vî rengî de mafê hemû pêkhatiyên bi wekhevî ango bi dadwerî bide xuyanîkirin, û bi vî rengî, ne Kurd û ne Ereb û ne jî Asûr an Suryan wê bi kînan bin, mixabin Biratiya Gelan û Hevjiyan Hevbeş di

vê demê de bûne dirûşmin ji bo danheva pereyan, ji ber em dizanin ku çi qas ev têgeh bi bandor e. Bêguman eger em li nivê dagirtî ji peyalê binêrin, gellek ji rêxistinên civaka sivil erkên xwe bi cih tînin û tev ku ev kar karekî nû ye, lê ew bi paqijî nerîn û ramanên xwe dighînin millet ji bo pêşketinê, ji aliyê mijarên girêdayî bi aştiya navxweyî, û ev tişt diyar e, ji ber ji çar salan ta roja îro gellek hevkarî di nav pêkhatiyên Qamişlo de ji aliyê gellek mijaran ve çêbûye, û ne tenê wilo, lê ev rêxistinên civaka sivil gellekî alîkar bûn ji bo ku her pêkhatiyek çanda yê ditir nas bike. Ez bawerim tenê hêviya millet ew e ku di vê qonaxa veguhezane de qezencekê ji van têgehên werbigrin.



DIBISTANA PILINGÊN TAYKWENDO DIXWAZE XEWNAN BIKE RASTÎ

Idrîs Hiso

Bawerî bingeha her kar û xebatê ye, diyar e ku berpirs û endamên "Dibistana Pilingên Taykwendo" li bajarê Heskê (Rojava yê Kurdistanê) xwedî bawerî bi mirovatîyê û bi xwe hene.

Li Sûryayê û Rojavayê Kurdistanê di dema berî şoreşê ve, di dema şoreşê û piştî wê jî ne hesan e ku mirov karekî serbixwe û azad bike, lê xuya dibe ji kar û encamên karên dibistanê heger mirov xwedî bawerî, vîn, û biryar be, dikare sînor, diwarên astengiyên, arîşe û bêhêviyê bişkinê.



Ji havîna sala 2009 an ta wek aniha, her zarokê ku derbasî vê dibistanê bûye bi reng û dengêkî din jê derketiye, ne tenê zarok ta bi jin û mêran jî. Lêbelê dibistan bêhtir guhdanê bi zarokan dike.

Her kesek bi çavên xwe cîhanê dibîne, nerîna vê dibistanê li cîhan û mirovatîyê, nerîna bidestxistina serkeftin û pêşveçûnê ye, rewş çî be bila ew be, lewma em dibînin dibistan wek maleke hevgirtî û hevhez gav bi gav pêş ve dice, û armancên berbiçav pêk tîne.

Di maweyê 5 salan de Dibistana Pilingan dikarîbû bibe diyardeyek li bajarê Heskê û tevayî herêma Cezîrê, û ew dikarîbû navê Heskê û Rojavayê Kurdistanê bighînin gellek welatan, her wisa dikarîbû gellek armancên xwe pêk bîne, û bi encamên baş jî.

Mirov bi kurtî dikare li ser van Encaman raweste:

-2009 an pileya 4 an li ser asta Sûryayê.

-2010 an pileya 3 yan li ser asta Sûryayê.

2011 an gellek encam bidestxistne, gellek endamên Dibistanê bûne yarîger di tîma Sûrya ya niştmanî de, her wisa di sala 2012 an jî gellek serketfin bidestxistine, û di sala 2013 an de ligel dehên çalakî û karên

curbecur, civakî, hunerî û zanistî, mîna şevbêrkên bo hunermendan, êvarên bo çîrok û helbestê, êvarên temaşekirina filman, pêşengehên şewekarî û xulên zimanê (Kurdî, Inglîzî, Frensî), ligel hin çalakî di warê perwerde û fêrkirina zarokan û xula fêrbûna fotografi de.



Ta bi çapkirin û belavkirina kovarek mehane bi navê XEWN, ku balê dikîne ser çand, huner, werziş, zanist û ziman (Erebî, Kurdî, Inglîzî), lê şehnazîya mezîna di vê salê de ji wan re, û him ji endaman re, û ji şênîyên herêmê (bi giştî) re ew bû peşdarîkirina wan di pêşberka navdewletî li bajarê Ordo li Turkyayê, û bi destxistina bêtir ji 6 mîdaliyên navdewletî ku yek ji wan a zêrîn bû, bi navê yarîger ALA HESEN ku temenê wê 15 sal e, û mîdaliyek zîv bi navê SÎVÎN HISÊN

ku temenê wê 12 sal e, û 4 mîdaliyên Bironz jî, her wisa tîma dibistana wan baştrîn tîm bû di vê pêşberka navdewletî de, tevî ku gellek dewlet peşdar bûn, mîna Iraq, Turkiya, Azerbîcan û Îran, ji bo dibistana wan ev karekî mezîna û payebilind e.

Dem a rêveber û rahênerê wê "Ezîz" behsa vê destkeftî û serkeftinê dike mirov dikare cirûskên hevî, dilsozî û vîn a mana li welat di çavên wî de bi zelalî bixwîne, tevî ku gellek kes xwe ji welat dikînin bi behaneyê ku derfetên sirûştî ji kar û çalakiyan re nema ye. Ji ber rewşa wêranbûyî ya

welatê Sûryayê, gellek astengî têne pêşya vê dibistanê, cinku û wek ku "M.Ezîz" tekez dike ew nikarin bi balefiran derkevin derveyî welat, nemaze ew ne bi navê rêcîmê û ne jî bi navê opozîsyonê çalakiyên xwe dikin, ew bi navê gelê Sûryayê beşdarî pêşberkan dibin û çalakiyên xwe lidar dixin, tevî ku gellek aliyan xwestin çalakî bi alîkariya wan be, lê ew razî nebûn. Lê tevî wilo ew wek tîmek kurdî ji Rojavayê Kurdistanê tîna nasîn.

M.Ezîz wiha dibêje: "Gellek vexwendin ji me re tîna ji welatên Erebî û Ewropî,

wek mînak berî demekê vexwendin ji me re ji Urdunê hat, û ji Ermenistanê bo em peşdaî pêşberkan bibin, û ji bo em karibin sînorê welat derbaskin tenê du dergeh li ber me hene, Sêmalka û Dirbêsyê, ev her du dergeh jî di dest kurdan de ne, lewma tenê doza me ji wan ev e ku karibin alîkar bin ku dergeh ji bo me vekin û hew, me tiştêkî din navê, her wisa yên li aliyê din ji sînor jî".

Di çend hevokên kurt de mamoste "Ezîz" wiha li ser karê xwe diaxive: "Me bawerî bi werzeşekî zanistî heye, dibistana me ne tenê laşan ava dike,



em dixwazin hişekî bîrwer û laşekî bi hêz ava bikin, armanca me ew e, em karibin nifşekî werzeşî xwedî hêz û bawerî ava bikin, nifşekî werzeşî nû. Çinku em bawer in tiştêk wek xwe namîne, û her tişt di jiyane de ber bi pêş ve diçe".

Ji ber vê nerîn û baweriyê, em dibînin sal bi sal ev dibistan program û armancên nû li pêşya çavên xwe datînin, bi astek bilindtir ji salên çûyî,

û her dem kar dikin bo pêkanîna van armancan. Bêhtir ji 60 kesî hatiye amadekirin bo wergirtina kardên yarîgerên navdewletî, 20 ji wan hatine nivîs wek yarîzanên navdewletî, û ev bi serê xwe serkeftinek gewre ye bo Herêma Cezîrê û bajarê Heskê, bi hemû pêkhateyên xwe. Dema mirov li tevger û çavên yarîgerên "Dibistana Pilingên Taykwendo" dinêre, mirov bi hesanî dikare nas bike kesên ku dixwazin dar û gulên hevyan

biçînin hîn li ser vê xakê hene, dev û dêmên keç û xortan yek xulek bê ken namîne, li vir, li rûpelên rûyên wan mirov dikare paşerojek bi rengekî din bixwîne. Dema yarîgerêk, an rahênerêk, li ser hevî û armancên bê sînor diaxive, tu dibêje qey ev ceng û şer ne li vî welatî dibe, ev gênc û keçên wek gulên, tevî zehmetyan. Ji Salihiyê, ji Heskê delal alaya avakirina jiyaneke bi rûmet hildidin, û bawer in wê serkeftin para wan be.



REWŞA DERMAN LI HERÊMA CIZÎRÊ , JI KIRÎZEK DEMKÎ BER BI PLANÊN DEMKÎ VE

Ebas Mûsa

Nimûneyek Berbiçav

Ji demek nêzik ve Jina koçer ya bi navê "Nazê Reşîd" ji gundê Tebkê ku girêdayî bajarê Dêrikê yê, bi lez ew anîn nexweşxaneyê Dêrikê, piştî ku kûçikê dev wê kiribû, li ser sînore başûrê kurdistanê, lê derziyên taybet bi devlêkirinên kuçikan tune bûn, Nazê Reşîd bi dewsa devlêkirina kûçik li dirêjahiya rojekê ma beriya ku çareseriyê jê re bikin. Her wisa kesên ku tûpiş an mar bi wan vedidin heman pirsgirêk li pêşiya wan e; dermanên wan pîr kêm in.

Pileya germahiyê li bajarên herêma Cizîrê di havîn de bilind dibe, carinan dighêje dora 50 pileyî, û ev tişt bi rengê xwezayî dihêle ku mar û tûpişk pîr bin. Nexasim di jingehêkê mîna ya Herêma Cizîrê ku nêzî jingeha beyabanê ye.

Rewşa Şer li Sûryayê û Bandora wê li Ser Dermanan

Ji 2012an ve astengiyin pîr mezin li

pêşiya rewşa mirovahî hene, şerê ku li bajarên Sûryayê diqewimin, bitaybet li gundewerên Şam, Hims, Heleb, vî şerî zîyanin pîr mezin gîhand sazxa-neyên dermanan, vê yekê hişt ku hin cureyên derman qutbibin.

Tiştin pîr girîng jî mîna şîrê zarokan, dermanê kulbûnê, dermanê şekir û hin cureyên din, tev ku gellek rêxistinên sîvil tibabin ji derman dişandin, (hin ji wan ji dewletên bi navê hevalên gelê Sûrî), lê di wê demê de ta aniha Herêma Cizîrê dorpêçkiriye, ji hemû aliyan ve, lewra kete kirîzekê ji gellek aliyan ve, yek ji van aloziyan qutbûna derman bû.

Rêjeya belavkirina derman li seranserî Sûryayê di salên kirîzê de, kêm bû. Rêje daket kêmî 80 %, piştî ku 90 % ji pêdiviya bazara navxweyî pêktanî, û her wisa dişand ji dora (75) dewletên erebî û biyanî re.

Ji encama şerê ku li Sûryayê diqewime, gellek sazxa-neyên

dermanan bûn armanca wêrankirinê –li Şam û Helebê- kar li pîrraniya wan rawestiy, û her wisa gellek cureyên derman neman.

Tê zanîn ku Dr.Mehmûd Hesên, neqîbê dermansazên Sûryayê ji çapemeniyê re ragihandibû: "Mijara derman aloz e û bi şeweyekî hêsan û bi lez nayê çareserkin". Û tekez kir: "Hîn rêjeyek baş ji sazxa-neyên dermanan li deverên bi ewle û yê ne ewele jî kar dikin". Her wisa anî ziman: "Dermanê ku bi şeweyekî navxweyî çêdibe, pêdiviya 80 % ji bazara Sûryayê pêk tîne".

Lê di heman demê de jî, Hesên da xuyan: "Pirsgirêk di warê dermanên nexweşiyên taybet de ye, ku hejmara wan (32) cure ji derman e, bi taybet yê pençeşêran".

Dermanê ku nêzîka 100% li sazxa-neyên Sûrî saz dibûn, û pêdiviyên dermanxane û nexweşxaneyan li seranserî Sûryayê bêktanî, ev sazxa-

tenê li bajarê Şam, Heleb, Hims, û vê dawiyê li Tertûsê kom bûn, birrîna rê hişt ku dermanên ji van bajarên tîn, li ser herêma Cizîrê qut bibe, û her wisa aloziyên pîr mezin peyda kir.

Pêdiviya Herêmê bi Dermanên Demsala Havînê

Em dikarin li ser du rengên derman rawestî; dermanên ku di dermanxaneyan de peyda dibe, û dermanê ku tenê li nexweşxaneyên giştî yê girêdayî hikûmetê, û sazîyên wê ve, yan jî yê ku di rêxa rêxistinên navneteweyî re dighêjin herêmê.

Devlêkirina kûçikan û pêvedanê tûpişk û maran, dikevin çarçoveya dermanên taybet, ev dermanê taybet tenê li nexweşxaneyê niştamanî li Qamişlo peyda dibe, ew jî her tim tune ye, jixwe em ger nas bikin bê ji Dêrikê ta Serêkaniyê –ji bilî li wir peyda nabe- em ê nas bikin ku qutbûna wî kirîzekê çêdike. (Dr a.m) nexwest nave xwe eşkere bike ji

kovara Şar re dide xuyan: "Aniha Ev derman peyda dibe, lê carinan qut dibe, ji ber ku ev derman tenê li vê nexweşxaneyê heye, û welatîyên li seranserê vê herêmê berê xwe didin vir, ji bilî vê yekê jî carinan em nizanin bê sedema vê qutbûnê çi ye! Ji ber ew girêdayî wezaretê tenduristî li Şamê ye".

Nazê Reşîd bi xwe jî ji berya heyvekê –di nîsanê de- li vê nexweşxaneyê bû, û derman tune bû. Dema ku kûçik dev Nazê kir, ew bi xwe ji aliyê gundê Sihêla yê li Başûrê Kurdistanê, lê ji ber ku qaçax derbas bûbû nehiştin ku derbas bibe.

Ji aliyê xwe ve Egîd Ibrahîm rêveberê Heyva Sor a Kurd ji Şar re axivî û got: "Hêvî û soz hene ku dermanên taybet bo devlêkirina kûçikan û pêvedana mar û tûpişkan peyda bibin"

Lê li gorî belgeyên Heyva Sor wan navê 60 nexweşî li cem xwe tomakirine, yê ku gurçik çandine

dermanekî taybet bo wan gerek e, û ji bo nexweşiya Naûrê jî malbatek ji Qamişlo ku sê ji wan bi vê nexweşiyê ne, bi dermanekirine.

Ji hêla din ve weku Egîd Ibrahîm da xuyan ku embareke wan î mezin heye bo derman, û pîrraniya derman di vê embarê de peyda dibe. Û dermanê pençeşêrê (seretan) aniha heye, lê hîn belav nebûye.

Dermsaz Lazgîn Ehmed li ser rewşa derman dibêje: "Dermanê ku li dermanxaneyan, 95% jê peyda dibe, û ew jî ji berhemên sazxa-neyên Sûrî ne, bitenê pirsgirêka peydabûna hindêk cureyên derman heye".

Jixwe dermanê ku ji sazxa-neyên Sûrî peyda nabin, dermanê qaçax jî derbasî herêmê dibe, lê ne bawerîya nexweşan xweşik pê tê, ne jî ya dermsaz û bijîşkan. Dermsaz Lazgîn dibêje: "Li gorî bikaranîna me ji dermanan re, bitaybet ji du salên berê, ji dermanên qaçax re yê ku



di rêya Başûr an jî Bakurê Kurdistanê re, hat xuyakirin ku dermanê li sazaxaneyên Sûrî saz dibin ji tevan çêtir û erzantir e". Di 2012an û ta nêzî 2014an de kirîzek di milê peyda kirina hin cureyên derman de hebû, her wisa şîrê zarokan jî, û li himberî wê jî gellek ziyar gihîşte nexweşan, û rewşa gellekan jî xerb ket.

Aniha rengê kirîzê bêhtir e (di warê derman de), ti kes nizane ta çi qasî wê herêm bikaribe li himberî qutbîrîna rêyan rawest e, heger rêyên balefiran (yê ku pirraniya dermanan aniha di wê rêyê re tên) bèn birrîn?

Ev bersiv me ji karmendên hin embarên dermanan girt, ên ku dibêjin: "Heger qutbîrîneke wisa çêbibe, wê kêmbûna derman di heftiyekê de xuyanî bike".

Tenê li Qamişlo nêzî 50 î embarên derman hene, (bêhtir ji nivê van embaran bi rengekî nefermî kar dikin), lê pirraniya van embaran ji demek nêzîk ve vebûne, û ti stratîcîk xuya bo hilandina derman bi gellekbûn, bi awayekî dirust û guhdaneke taybet tune ye. Can (navê xwe yî dirust eşkere nekir) ji Şar re dibêje: "Pirrê xwediyên van embaran bazirgan in; tenê li pereyên xwe digerin".

Pêwîst e Aliyên Berpirsyar Çareseriyên Peyda Bikin

Ji 2012an ve her tim rewşa derman

di erênayê de ye, û her car kirîzek peyda dibe, rengê çareseriyên jî ew e ku rêxistinên navneteweyî alîkariyan pêşkêş bikin, an jî embarin mezin û bi mercin rewa bo parastin û guhdana bi dermanan, ava bikin. Ji ber ku yek ji pirsgirêkên qutbûna derman an jî metirsî ji vê yekê birrîna rêyan ne, pêwîst e ku rêxistinên tenduristî yên fermî (Desteya tenduristî di Rêveberiya Xweser ya Demokrat de, yan Wezareta Tenduristî li Şamê) çareyên stratîcîk peyda bikin. Dibe ku yek ji wan sazaxaneyên derman li Herêma Cizîrê ava bibin, an jî hindêk ji wan sazaxaneyên ku li parêzgehên



di nêzî Sûrî kar dikin (ku di rewşeke pirr zehmet de ne) bêne veguheztin bo Herêma Cizîrê.

Li gundê Tebkê jî çîroka Nazê Reşîd a ku ji Dêrikê ta bi Qamişlo ta dergehê Sêmalka û nexweşxaneyê Zaxo û

Dihokê, wê dehê çîrokên wisa hebin ger çareseriyên bi rengekî dirust jê re neyên danîn.

Çîrokên wisa tim belge nabin, lê helbet gellek in, û li cihekî wekî Dêrikê ku berê me li havînî ye metirsiya mar û tûpişkan pirr heye, jixwe ligel peydabûneke kêr ji cureyên derman ên taybet bo vê rewşê.

Li gundê Tebkê jî çîroka Nazê Reşîd a ku ji Dêrikê ta bi Qamişlo ta dergehê Sêmalka û nexweşxaneyê Zaxo û Dihokê, wê dehê çîrokên wisa hebin ger çareseriyên bi rengekî dirust jê re neyên danîn.

Çîrokên wisa tim belge nabin, lê helbet gellek in, û li cihekî wekî Dêrikê ku berê me li havînî ye metirsiya mar û tûpişkan pirr heye, jixwe ligel peydabûneke kêr ji cureyên derman ên taybet bo vê rewşê.

BES E

Hesen Helîmê

Berî ku ez vê gotarê binivîsînim, ez gellekî dudil mam, gelo ez binivîsînim an na?

Lê rewşa ku helbesta kurdî, li Rojavayê Kurdistanê, gihîştîye yê, hişt ku ez nerîna xwe binivîsînim, tevî ez dizanim ku gotareke wilo kin mafê rexneyê nade.

Ligel şopandin û xwendina min ji kovar û rojnameyên ku derdikevin, an şevbuhêrkên ku lidar dikevin, û pirraniya berhemên ku hatine çapkirin, hiştin ku ez li ser mijara nûjeniyê rawestim –ji pêvî çend pênûsan- ji ber nûjenî guhertina rengê pêlewaziyê di helbestê de derbaskirîye, û ne hew paşguhkirina behrê Ferahîdî ye.

Nûjenî berî her tiştî nûjeniyêke di nerînê de ye, bi helwesteke nû û bingeîn ve girêdayî ye, bi mirov û hebûnê ve, bi surîşt û jiyandê ve jî.

Bêgûman helbest ew e; ya ku cihê xwe di nav helbestên nemir de digire, ew helbesta ku hestekî li cem mirove çêbike, ne ya ku hestê mirov bibêje.

Dema helbestvan xwe ji kêş û rêbaza pêlewaziyê rizgar bike, divê ew hêza han bibe hêzeke hestiyarî û ramanî û dawerive canê rista nûjeniyê.

Li vir tiştê hatiye nivîsandin bi pêlewazî berî sedê salan an bêtir, aniha nûjen-

ti rîn helbest in, mîna "Rambo" ku nivê helbestên wî pêlewaz in, karên "Bodlêr" tevde, û her mînak pirr in.

Li vir, mirov dikare bibêje ku nivîsandina kurdî di hingameyekê de dijî, çi ya pêşe û çi ya pêlewaz!

Nemaze ya pêlewaz, ew şaştiyeke mezin e ku mirov navê pêlewaz li wan bike, ji ber tiştê ku heye ne li ser bihûrê Ferahîdî hatine rêsandin, an li ser kêşa hespên Cegerxwîn, hew metmaneyê li ser lihevduanî û jimara tîpên dengdêr di hemû malikan de dikin, û naveroka wan hîn giş pesin û şîret û daşorînin.

Wilo gellek pirs xwe diyar dikin, gelo ev kesên van berhemên dinivîsînin, çi reng ji wêjeyan xwendine? Yan çi dixwînin? yan asta wan a pîvana nîrxandinê çi ye? Û gelo helbestek cuda dinivîsin? Ma zîmanekî hestiyar î taybet li cem wan peyda dibe?

Divê mirov pêwaneyên nûjeniyê nas bike, û nûjenî di kakila nerîna me de be, wilo ez tekez dikim ku têgihîştina wateya rast ji helbesta nûjen re ne li gor forma helbestê ye, çi pêşe be yan pêlewaz be, meger divê ku em lê binerîn, ka ew ristek ji pêwendên nû ne, di navbera helbestvan û ramanan de, û di navbera helbestvan û zîmanan de, û di navbera bêjeyê û bêjeyê de,

û di navbera bêjeyê û tiştan de; bi vî rengî xuya dibe ku forma helbestê ti bandora wê li ser nûjeniyê tune ye.

Sihîtên nivîsandinê li cîhanê gellek in, bê gûman xwendina wan mirov dighîne danasîna helbestê, wek (Borxês, Oktaviyo pas, Bozon-haykoyê çaponî- ,Sirûdên Çiîni, Ritsos, Kefafês, Ebî Temam....).

An ên Sofî wek: Hafîzê Şîrazî, Cizîrî, Nîferî...

Di encamê de helbesta nûjen mirov dibe nav gerînokên derûn û xeyalê de, raman û xewnan, tişt û tersî wî, û dengê sura bê dighîne hestê guhê mirov.

Gerdiya di nav dûmanê de dide xuyakirin, mirov bi ser jêdera razên, ên ku di jiyandê de veşartî ne, vedike, û tiştên ku mirov nabîne tîne ber çavên wî.

HEVPEYVÎN BI NIVÎSKAR Û WERGERVAN EBDELA ŞÊXO RE

- Weku tê gotin, her mirovek di jiyane de hestê nivîsandinê li cem wî heye, ta çi radeyê ev gotin rast e, gelo nivîsandin bi mirov re tê afirandin (mîna behre) an nivîsandin jî çêkirin e?

Ez dikarim bibêjim ku nivîskarî bêhtir hêçana (tecribeya) xwendin û nasîna piralî ye. Heger em bala xwe bidin hêçana hin nivîskarên serketî, em ê bibînin ku wan koşka nivîskarîya xwe kevir bi kevir lê kiriye, an ku nivîskarî avakirin e bêhtirî ku behremendîyeke xwerû û sade be; lê helbet aliyê nivîskarîyê yê behremendane jî heye. Em dikarin vê yeka han di tecribeya Selîm Berekat a nivîskarîyê de bibînin: Wî helbesta xwe ya pêşîn di hevdeh-salîya xwe de nivîsiye ku ev yek jî behremendî ye li gor min, lê heger em bala xwe bidin avakirin û bikeyskirina kesayetîya nivîskar û sêwirandina xeta nivîskarîyê, em ê bibînin ku wî yekem berhevoka xwe ya helbestan di 1973yan de weşandiye û yekem romana xwe di 1985an de; ev berhema xwendin û biservebûnê ye, nemaze li ba nivîskarekî mîna Berekat ku romanên xwe ro dike di bilûl û qalibekî helbestî de. Yanî gava ku em Şikeftên Haydrahdahosê, Dilşad, Mirîyên Sade û romanên din ên Berekat dixwînin, em bikaranîneke bêsînor a mitolojîyê û bûyerên dîrokî dibînin, em li zimanekî Erebi yê wekî çemekî har rast tîn; ma ev ne berhema xwendina zêde ye?! Berekat sê pirtûkên zarokan ên piçûk nivîsîne, di pirtûka bi navê "Nêrgiz"ê de, Berekat çîroka xwe ya pir kin li ser hîmê efsûna Yûnanî ya bi navê "Narcissus" ava kiriye. Her weha bûyerên dîrokî yên kêşedar, amajeyên sîyasî û derûnî di nava nivîsên wî re derbas dibin, yanî behremendî dikare

bi hêsanî li ber bayê nezanî û xweçarçovekirinê biçe.

- Di civakeke mîna civaka Kurdî li Rojavayê Kurdistanê de, guhdana bi zimanê Kurdî qels bû, sedema vî tiştî çi bû? Û çaxa ku em aniha li nîfşê nû dinêrin, nexasim piştî Şoreşa Sûryayê, guhdan bi zimanê Kurdî çêbûye yan na?

Helbet berê qels bû û niha di çaxê ajdan û zildanê de ye. Berê qels bû ji ber ku kesayetîya neteweyî ya Kurdî bi temamî li jêr barê bindestî û zorbazîyê bû. Ne tenê zimanê Kurdî, Kurdayetî wekî çandêke jîyanî heta radeyê mezî qedexê bû. Yanî gava ku li welatekî, navlêkirina merivan bi zimanekî qedexê be, gelo em dikarin di vê atmosferê de behsa "guhdana bi zimanekî bikin"! Miletê nikare zimanê xwe -bi dizî- bi pêş ve bibe. Lê niha guhdan û pûtepêdan zêde bûye ji ber ku atmosfereke azad çêbûye, lê tevlihevî û bêserûberîyeke tirsnaq heye, yanî her tişt bê pergale. Ev awayê han nikare xizmeta bipêşvebirina ziman û çanda Kurdî bike. Divê karê wêjeyî bi pisporî were meşandin û dûrî çanda partîzanî, hevalbendî û xal û xwazîtîyê be.

- Pirraniya nivîskarên Kurd li Herêma Cizîrê bi zimanê Erebi nivîsand, helbet behaneyê wan jî zordariya rejîmê bû, lê di heman demê de jî gellekan bi Kurdî dinivîsand, çima ev guhdana pîr bi zimanê Erebi? Û weku rexne, çawa em dikarin li wan nivîskarên Kurd ên ku bi Erebi dinivîsand, binêrin?



Helbet min li jor behsa vê yekê kir, wan bi Kurdî nenivîsi ji ber ku derfeta nivîsina bi Erebiyê hebû lê ya bi Kurdîyê tunebû, ji ber vê yekê jî te gotina "nivîskarên Kurd" di pîrsa xwe de bi kar anî, an ku ew nivîskarên ku bi koka xwe Kurd in lê Erebinivîs in. Pîranîya nivîskarên ku bi Kurdî dinivîsand neçar man ku bar bikin an jî her dem û demekê rastî gef û çavsoîya rejîmê dihatin. Belkî carinan rejîmê çavên xwe digirtin, lê rewşa giştî rê nedida avakirina derdoreke wêjeyî ya Kurdî; jixwe çapkirina berhemên Kurdî qedexê bû, ma wê nivîskar jî xwe re binivîsin? Gelekan li Beyrûtê çap dikir û li derdoreke teng belav dikir, hinekên din jî li Bakurê Kurdistanê çap dikir. Welhasil, nivîskarîya bi Kurdî bar bû. Ev zordestîya han hişt ku nivîskarîya bi zimanê Kurdî li Rojava bibe xebateke neteweperwerane û vê yekê jî hişt ku nivîskarok derkevin holê ku em heta niha jî derdê wan dikişînin. Lê dîsa jî divê keda wan nivîskarên Kurdîyê neyê jibîrkirin, bi taybetî ewên ku "bi rastî" nivîskar bûn, an ku berhemên hêja di bin nîrê zordestîyê de û di nava Rojavayê Kurdistanê de afirandin û belav kirin. Keda wan qurta xelasîya ji mirinê bû.

- Gellek dibêjin ku zimanê Kurdî qels û lawaz e, ji lewra têra mirov nake ku karibe di mijarên ramanê yan felsefe û zanistê de binivîsin, jixwe tu karê wergerê ji bo Kurdî dikî û te romanên Selîm Berekat û romaneke Elî Elmuqrî û gellek tiştên din wergerandine Kurdî. Gelo ev behaneyê han rast e?

Ev gotineke pîr beredayî ye û li gor min, ev "gelek kes" ne hêjayî bersivdayînê ne jî. Ji qewla Kurdan ve: "Ji xwe

re diçînin şorbê" û "ji aş û başan dipeyvîn". Heta niha dagirkerên Kurdistanê, nemaze sîyasatmedarên Tirk vê yekê dibêjin; ev gotin sîsika dagirkeriyê ye. Zimanekî qels tune, lê zimanek heye ku derfeta nivîsandin û afirandinê nedîtiye. Berê hin akademîsyen û nivîskarên Tirk digot ku zimanê Kurdî têra nivîsandina romanekê jî nake! Helbet hayê wan jê tunebû ku Erebe Şemo yekem romana Kurdî "Şivanê Kurmanca" di sala 1935an de li Rewanê (Ermenistanê) nivîsandiyê û weşandiyê. Jixwe li vir em dikarin behsa serbihuriya Kurdên Ermenistan û Kafkasyayê bikin di dema hikimdarîya Yekîtiya Sovyetê de. Li gel hejmara kêma nifûsa Kurdên wê herêma û li gel derfetên kêma jî; ziman û wêjeya Kurdî di wê heyamê de bi rengekî berfireh pêş ket. Bi saya wê derfetê, îroj gelek şahberhemên hêja yên Heciyê Cindî, Qanatê Kurdo, Elîyê Evdilrehman, Erebe Şemo, Miradê Qaçax, Emerîkê Serdar...hwd li ber destên me ne. Em îroj pê şanaz in ku helbestkar û wergêrekî me yê qerase yê mîna Fêrikê Úsiv û folklorîstekî me yê bêminak ê mîna Xelîlê Çaçan hebûn. Kurt û Kurmançî, kesê biyanî yan Kurd ê ku dixwaze bizane ka zimanê Kurdî têra felsefe, zanist, matematîk, hizir... hwd dike yan na; bila kerem bike fêrî Kurdî bibe û lêkolîneke berfireh li ser peyvnaşî û dewlemendiya Kurdîyê çêke. Wekî din, ma gelo qey zaravayê Soranî ne şaxekî zimanê Kurdî ye?! Îroj bi dehhezaran berhemên felsefeyî, hizirî û zanistî hatine nivîsandin bi zaravayê Soranî û ev zarava fermî ye li Başûrê Kurdistanê. Kurd ne neçar in ku bersiva gotinên eletewş û bêbingeh bidin. Ev yek dişibe tawanbarkirina Kurdan bi cudaxwaziyê ji aliyê dagirkerên Kurdistanê ve. Ma divê gelê Kurd her dem ji xelkê re bipewîştîne ku zimanê wî têra nivîsandinê dike yan na?! Zimanê Kurdî têra xwe dewlemend, kevnar û peyvçêker e. Yanî ez dixwazim vê bibêjim, Kurdî -wekî hemû zimanên cîhanê- dikare hemû aliyên jîyanê li jêr sîya dara xwe ya sîber bicivîne, lê divê alaya Kurdan li ba be, ji bo ku yekî nezan/faşîst nebêje zimanê we têra wî tiştî dike û têra yê din nake!

- Gellek kêmanî di warê çapkirin û belavkirinê de li Rojavayê Kurdistanê heye, li gorî ezmûna te di karê weşanxaneyê de, rola çapkirin û belavkirinê bo pêşketina zimanê Kurdî, her wisa naskirina çanda neteweyên din çi ye?

Li vir, tu destê xwe nadeynî ser birînê, tu kêreke ko di birîneke edabgirtî de dilivînî. Li bajarekî wekî Qamişloyê, ku nifûsa wî zêdeyî niv mîlyonî ye, pirtûkxaneyekê Kurdî tune, ne weşanxane!! Em behsa çî dikin?

Qey em di guhê gê de ne? Ev rewşeke pir kambax e. Gava tu besh dikî, dibêjin nivîskar an jî bazara zimanê Kurdî li Rojava tune. Ê baş e, nexwe çima nivîskar û wergêrên Rojava berhemên xwe li Bakur çap dikin û diweşînin?! Ma di salên nodî de gava ku Kurdên Bakur dest avêt karê weşangeriyê, bi dehhezaran xwînerên Kurd hebûn, yanî bazara xwendina berhemên Kurdî ew qasî geş bû? Ez sal û nîvekê di Weşanxaneyê Lîsê de xebitîme, heta niha jî bazareke geş a xwendina berhemên Kurdî li Bakurê Kurdistanê tune! Nexwe çima weşanxaneyên Bakur deriyên xwe danadin û nabêjin: "Serê we sax be, ne xwîner hene, ne nivîskar!"

- Li bajarê Qamişloyê, gellek pêkhate bi hev re dijîn: Kurd, Erebe, Suryan û Ermen, teybetmendîya Qamişloyê bi vê cihêrengiyê hîn xuya dike yan na, û bandora vê rengerengîya han li ser te wek kes hebû?

Helbet, jixwe bedewî û çelengîya me bi vê rengerengîya han belî dibe. Em wekî civak li ser bingeha hezkirina vî bajarê keskesorî mezin bûne. Vê taybetmendîya han mohra xwe li hemû bajar û herêman Mezopotamyayê daye. Jixwe heger em bala xwe bidin wêjeya devkî û nivîskî ya vê erdnîgarîyê, em ê bandora vê rengerengîyê bi eşkeretî bibînin. Carinan gava ku em li muzîka Ermenî guhdarî dikin, em nizanin ew li ku diqede û ya Kurdî kengê dest pê dike. Heman tişt di nêzîkbûna gotinên pêşyan de diyar dibe. Ev têkilheviya çandî û çarenivîsî di wêjeya nivîskî de jî eşkere dibe, ma hindik nimûneyên vê yekê di "Her Du Jîyanname"yên Selîm Berekat de hene! Berekat di bîrhatiyên xwe de behsa jîyana hevbeş a Asûrên Xirîstîyan û Kurdên Êzidî yê gundên derdora Çemê Xabûrê dike, behsa Taxa Cihûyan a Qamişloyê dike, behsa Ereben rewend û koçer dike, behsa kesayetiyan Suryanî dike...hwd. Bi kuratsî, wekî kes, ez nikarim Qamişlokeke yekreng di jîyana xwe de bibînim, yekrengkirina Qamişlokeke tê wateya kirêtkirin wê, wekî ku tu xwe ji dîroka xwe tazî bikî. Ji ber vê sedemê, gava ku birayên min ên Ermen, Suryan û Erebe tîna bîra min, ez dixwazim bêhtir sewda-serîya evîndarên kilamên dengbêjên Kurd binim bîra xwe; dixwazim evîna Qîza Mela ya Kurd û Îbrahîmê Fileh, evîna Meyrema Fileh û Elîyê Qolaxasî yê Kurd û kezobşewatîya dengê Şakiro yê li ser Ereba lîvdeqandî binim ber çavên xwe. Ev tenê têra min dikin ku ez bême vegevazandin di bêrma vê rengerengîya Deştê Tozê -welatê li bin Xetê- de.

SERÊKANIYÊ, ÇAVKANIYA XABÛRÊ

Zuhrab Qado

Li biniya bajarê Serêkaniyê ya aniha, û di nava Girê Fixêriyê (Tel Fixêriyê) de, dîrok û navnişana vî bajarî, rewşa Xabûr û kaniyan, razayî ye, mîna ku kaniyek be û çil û çar kanî derbûne li dorê. Bi dirêjahiya sedên salan ev dever bi heman nav, û heman wate, bi zimanin curbecur, hatiye naskirin û vegotin. Serêkaniyê çîroka cîhan a Mezopotamyayê bi kurtî ji me re dibêje.

Di salên 1911-1912 û 1927-1929 an de şûnwarnas "Max Von Oppenheim" ê ku li Girê Helefê (Tel Helef) vekolîn dikir; yê li rex bajarê Serêkaniyê ye, û navendek şaristanî yî pîr girîng e, axa Girê Fixêriyê peland û planek bo vedan û vekolandinê wê çêkiribû, di pey re "Calvin W. McEwan" ê Emerîkî jî di sala 1940 de hin lêkolîn kirin, pişt re "Moortgart" hin dever vekolandin û bermayiyên avahiyê û hin qehfîkên Nûzî û Xabûrê dîtin, Êdî xebatên di gir de 45 salan rawestiyên ta sala 2001ê şandek Almanî -Sûrî demsalekê tenê, vekolandinin nû dest pê kirin, lê di navbera sala 2006-2010 an de û ji hêla şandek Almanî û bi serpereştiya "Mûzexaneyê Berlîn" ya şûnwarên rojhilat û "Zanîngeha Tobingîn" û rêveberiya şûnwaran ya Şamê, xebatên vekolandin û lêkolînê di gir de berdewam kirin, lêbelê ew xebat û ji ber rewşa şer ya ku li Sûryayê

qewimîbû rawestiyên.(1)

Di bara van lêkolîn û vekolandinan de gellek şûnwarên ku vedigerin hemû ast û dewrên dîrokê, hatin dîtin, lê kêşeya herî girîng ya ku bala şûnwarnas û lêkolîneran dikişand, û ya ku mijara lêkolînê wan e heta bi roja îro, bajarê "Waşokanî" bû (paytexta dewleta Mîtanîyan). Di karnameyên qiralê Aşûrî (Eded Nêrarî yê yekem) de tê gotin ku wî "Ûşokanî" paytexta "Xûriyan" dagir kiriye, û di arşîva "Xatûşayê" paytexta "Hîtiyan" de navê Waşokanî hatiye bikaranîn, lê di serdema Aşûriyan de navê (Sîkanî) hatiye bikaranîn; ew jî li gorî nivîsa ku li ser pêkerê di sala 1979 an de li "Girê Fixêriyê" hatibû dîtin û yê ku vedigere (Hed Yesî bin Şems Nûzî) jî "Beyt Bextiyânî", û her wisa li gorî bêtirî çil tabloyên mîxî jî yê navi bikar tînin, û bêjeya Sîkanî jî sivikkirinek ji Waşo/Ûşo-kanî ye.(2)

Di serdema Romayê de û li gorî polik û preyên ku li "Girê Fixêriyê" hatine dîtin navê vî bajarî (Raseyna)bû; ev gotin bi wateya Serêkaniyê jî zimanê Aramî hatiye (bi Sîryanî "Rîş Eyno" û bi Aşûrî "Rîş Eyna"), di dema Imperator Septimius Severus(193-211.Z) ev dever metropolek romanî bû, lê dema Imperator Theodosius di sala (383 .Z) de wê dike bajar û navê wê dibe(Theodosiopolis) û cîgehê keşetiyê jî lê peyda dibe. Di dawiya sedsala şeşemîn.Z û di serdema şah Behramê Sasanî de ev bajar du

caran wêran dibe û di sala(640.Z) de dikeve bin desthilatdariya Ereben Misilman de.(3) Yaqût Ehemwî di pirtûka xwe (Mu'cem Elbuldan) de wisa dibêje: "Ras Eyn yan jî Ras Eleyin; bajarekî mezin î bi navûdeng e ji bajarên Cizîrê ye, di navbera Heran û Nisêbîn û Dinîsirê de ye, gellek kaniyên zelal lê hene û ji wan çemê Xabûrê pêk tê".(4) Ev rewş wisa berdewam dike ta serdema Eyûbî û Zenkiyan û di sedsala çardemîn de li ser destê Muxolan wêran dibe, pişt re di sedsala şazdemîn de dibe perçeyek ji dewleta Osmanîyan, û di sala1877- 1878 an de dîsa ev bajar û bi awayekî nû tê vejandin.

Ji wêrankirina Teteran ta bi salên heştêyî ji sedsala nozdemîn, Serêkaniyê kavi mabû, ta ku sultan Ebdulhemîdê duyemîn di sala 1877 an de koçberên "Çeçan" li devera di navbera Serêkaniyê û çavkaniyên çemê Xabûrê, bicî kirin, hejmara wan jî mezinbû, nêzî 5000 malî bûn, û di dawiya desthilatdariya Osmanîyan de nexweşiya "Tîfos" li nav wan peyda dibe û hejmara wan jî 5000 mal dadikeve 300 malî. Belê Serêkaniyê wê demê germiyangeha gellek êlên Kurd û Erbî bû, û bêguman ev dever bi herikandina çemê Xabûrê re û ber bi jêr ve wargeh û çêregeha bingehîn ya êla Milan bû, perçeyek serke ji bûyer serpêhatiya şer û pevçûnên di navbera êlan de û şûna şopa Hedbana Derwêşê Evdî bû. Di dema cenga cîhanê ya yekemîn de,



Osmaniyan stasyona trêne û qîşleyek li Serêkaniyê didin avakirin, û di pey re dibe cihê rûniştina wekilê walî. (5)

Di bara hatina Çeçanan de, Izet beg dibêje ku wê demê ji bilî Amûdê û Qeremanê û qîşleyek Osmaniya li Serêkaniyê, tiştek din li herêma nebû. (6) Êlên Kurdan jî konên li deverê vedigirtin, mîna Hiso Şivan Berguhanî û bilî wî. (7) Di wê demê de Brahîm paşa û bi giraniya êla xwe hukim li herêma dikir. Di 1908 an de êrîşek ji êla Iniza bi serkêşiya Ibin Hedat li ser serêkaniyê radibe û gellek ji şêxên wan tê de tîn kuştin, û di heman

salê de fermana Brahîm paşa jî radibe. Di bara bûyerên cenga cîhanê ya yekemîn de, Serêkaniyê yek ji navendên zindankirina Ermeniyên bû, û li gor dîroknasê ermenî "Rimond Kêvorkyan" kampeke Ermeniyên li ser Girê Fixêriyê hebû û pîrraniya wan bi sedema nexweşiyê mirin (8), Kurdên herêma jî hewldanin zor dikirin bo parastina Ermenyan ji tunekirinê, li hêlek din Ziya beg ê qayimeqam, wan jî çeçanan jî diparastin.(9)

Di sala 1915 an de 300 koçberên Siryan, Ermen, ji Mêrdînê li Serêkaniyê hebûn, lê piştî sala 1920 an û

xêzkirina sînor ev hejmar pirrtir bûn, Xiristiyanan, li derdora qîşleyê ji xwe re dêrek û bazar ava kirin, û Mala paşê jî Ebra wan xwe li wan digre û şûnekê ava dikin, û li başûrê bajêr jî Çeçanan ava kirin, û her wisa Merdelî jî piştî xêzkirina sînor li bajêr man û avahî kirin.(10)

Di sala 1935 an dest bi çaksazkirina erdan hate kirin û projeya herî balkêş bi rêveberiya malbata "Esfer-Necar" bû; ew malbatek siryan bûn ji Amedê berê xwe didin binya xetê û di projeyên çaksazkirina erdan de dixebitin. Wê demê dibin hevparê Milan û erdên wan çaksaz dikin û kompaniyekê bi navê "Esfer-Necar" didin çêkirin, û di encama wê de rûberek berfireh ji beriya Serêkaniyê şên dibe, û di sala 1953 yan de "Mebrûka" wek navendeke nimûneyî ji kompaniyê re didin avakirin.(11) Ew yek dibe sedem ku xelk ji kobaniyê ber bi Serêkaniyê ve bikişin da di çandiniyê de bixebitin (piştî salên 1950-1962). Pişt re li herêma Kîkan dest bi bikaranîna alavên nûjen tê kirin, ji lewra gellek cotkar ên bê kar dimînin berê xwe didin Serêkaniyê.(12)

Bi hatina Çeçanan re yekemîn mizgeft tê lêkirin a bi navê (Mizgefta Kevin- Buxarî), pişt re di sala 1945 an de Mizgefta Mezin- Şêx Me'sûm ava dibe, û pişt re Mizgefta Seyda. Û

yekemîn dêr ya Siryanên Ortodoks bû di sala 1933 an de, pey re ya Ermenên Ortodoks û ya Siryanên Katolik bû. (13) Ji aşên bajêr ên ku li ser avê dixebitin: Aşê Hecîko, Isma'îl beg, Elo Topal, Resûl(Tatyos), Bavê Gerebêt, û di salên şêstî de ji sedsala bûrî Hebib Meryemo aşeke bûzê nûjen ku li ser mazotê dixebite, çêdike. Her wisa Goristana Mihemed û ya Çeçanan û ya Xiristiyanan li ser Girê Fixêriyê ne û goristaneke Êzdiyan li rojhilatî Mizgefta Mezin hebû, lê di salên heftêyî ji sedsala bûrî de hate windakirin û li şûna wê bexçeyek hate avakirin.(14) Bêguman ev bajar xwedan bazar û pişesazî û xirecîrbû. Qehwexane: Eysê, Eslan, Elî Elhemo, Mahotê, Ehmedkan.

Tax: Taxa Çeçanan, Xiristiyanan, Merdeliyên li nava bajêr bûn, Kurd jî li rojhilatî bajêr bûn, û bi anîna Milan ji Ebra xwe re taxek bi vî navî hate avakirin; ji xwe Ebra Milan jî ji Ereban pêk dihat, lê pişt re bajar mezin dibe û taxin nû tîn avakirin û millet tevli hev dibin mîna Mehetê, Xeraba, Kornîş, Kehreba...hwd.(15) Ev bajar bi zengînbûna çandinî û bi kanî û seyrangehên xwe tê naskirin mîna: Kaniya Elzerqa, Salûba, Cebara, Camûs, Banûs, Hisan, ya Kibrîtê, û bêguman gellek bexçe li derdora wê

hebûn mîna: Bexçeyê Mihemed Elî, Hesên Feraş, Mihemed, û seyrangehên nûjen mîna Sîrob. Ji Êlên bajêr jî Dêwan, Berguhana, Dodika, Şêxan, Qeregêcan, Milan(Kurd û Erebi)...hwd.

Bêguman rengîniya ol û neteweyan li vî bajarî şêweyek ji hevjiyanekê di navbera wan de peyda kiribû, lê hikûmetên Sûryayê û bi taybet ya Be'is li ser tevlihevî û peydakirina nakokiyên di navbera şênîyên bajêr de dilîst.

Di 08/12/2012 an de û piştî hîlbûna şoreşa Sûryayê û ketina şênîyên bajêr di nava têkoşînek aştîyane de, nêzî 80 ketîbeyên bi navê vî şoreşê derbasî bajar bûn, û di encamê de rêjîmê bajar bi balefiran bombebaran kir, û 19/12/2012 an de yekemîn şer di navbera YPG ê û van ketîbeyan de rû da, di pey re rêxistina Islamî ya tundrew bû şûngirê wan di şer de û di pey re DAIŞ, û di 17/07/2013 an de bajar li ser destê şervanên YPG ê hate azadkirin piştî ku wêraniyek giran bi bajar û şênîyên wê ve, peyda bû. Di dawiyê de Çavkaniya Xabûrê, Waşokanî, Rîş Eyno, Serê Kaniyê, Ras Eleyn, vedana keda rengîniyê ye, û vegotina çîrokek ji xwe mezintir e.

(1) Kovara Jîn(Dezgeheke bo vejandina kelepurê belgeyî û rojnamegerî yî Kurdî), jimara şeşemîn, Dec.2014, rûpel 8-9 . (2) kovara Jîn, rûpel 4. (3) Heman jêder, rûpel 7.

(4) Mu'cem Elbuldan, Yaqût Elhemwî, rûpêl 801.

(5) Eltekwin Eltarîxî Elhedîs lilcezîre Elsûriye, Es'île we Îşkaliyat Eltehvil min Elbedwene île Elûmran Elhederî, Mihemed Cemal Barût, rûpel 120, Navenda Erebi ya Lêkolîna Siyasetan, çapa yekemîn.

(6) Ji devê Mamoste Emerê Evdikê, bi rêya axavtineke rasterast.

(7) Ji nivîseke nebelavkirî bi navê Serêkaniyê, Şewket Berazî. (8) Kovara Jîn, rûpel 8.

(9) Eltekwin Eltarîxî Elhedîs lilcezîre Elsûriye, Mihemed Cemal Barût, rûpel 120. (10) M. Emerê Evdikê. (11) Eltekwin Eltarîxî Elhedîs lilcezîre Elsûriye, rûpel 551-552.

(12)M. Emerê Evdikê. (13) nivîseke nebelavkirî bi navê Serê Kaniyê, Şewket Berazî.

(14) Heman jêder. (15) Heman jêder.



HOZANYARÎ DI NAVBERA XWEDA- NENASÎ Û OLDARIYÊ DE

Xweşnav Heso

Guman nemaye êdî, ku olên asîmanî hatin naskirin ji piştî peydabûna hozanyariyê (Felsefe) de, tenê her du ol "Zeradeştî" û "Hindosî" hebûn ji berî ku Hozanyarî bê naskirin û pêş ve birin. Kevintirîn hozanyarên cîhanê "Thales" bû, li gorî dîroka hozanyariyê ya ku dibêje "Thales" ew ê herî kevn e, û bêguman ew hozanyarê yekem e. Thales di sedsalîya nehan de, berya zayînê, jidayik bû, ango jiyana wî bi sedan salan berî zayîna Peyxember Mûsa bû.

Tevî vê yekê jî, hozanyarî ne gihişt asta xwe ya navdar û bi hêz ta dema "Socrates", "Platon" û "Aristotle". Û ev gihiştina hozanyariyê li gorî vê asta navdar û diyar ew bi temamî jî berî naskirina olan bû.

Dîroknivîsên Hozanyariyê dibêjin:

Efsane qonaxa yekê bû, û hozanyarî qonaxa dudyan bû, û jixwe ol jî qonaxa sêyem e. Lê nakokiya vê gotinê xuya dibe weke têgihîştina me di danasîna têgeha olê de, û ew dîroknivîs bi du layan li olan dinêrin:

1-Li gorî yê ku baweriyên xwe bi wan olan dikin.

2-Ën ku li ser van olan erê nakin û


baweriyên xwe bi wan nakin. Li ser van her du layan, beşê yakê li olan dinêrin wek gotinên pîroz ên ku ji Xwedan e, û ev jî tekez dike ku ol piştî hozanyariyê hatiye naskirin. Li ser beşê duyem, ên ku li olan dinêrin wek kevneşopên gelemperî, ew ji ser lêvên kesên û xewnên pîran hatiye peydakirin, ji vê hêlê ve em dikarin bibêjin ku ew bi rastî jî ji berî hozanyariyê peyda bûye, lê ew bi xwe bi vî rengî ne ol e, bêguman wê efsane be.

Dîmenên Têkiliya Hozanyariyê bi Olan re ev in:

Ol pergaleke sincî, civakî, rêzanî û derûnî ye, tenê ol bi perestîna ji hozanyariyê cuda ye, ji ber ku

Ol di rastiya xwe de pergalek hozanyarî ye, ji hêla wateyan û şîroveyan surîştî û paşsurîştî ve, tenê bi perestîna û tîrsa ji Dojehê, ji hozanyariyê cuda ye. Hozanyarî jî pergalek olî ye, lê ew di rêya mejî û belgeyan dest bi gavên xwe dike, bi hûrbînî û lêvegeran, di rêya gumanan de diji û rêka xwe di her mijarekê de, diyar dike, ku ew pêşkêşî mirovan dike. Ol tenê ferman dide ku mirov ji destpêkê ve li ser nivîsên wê erê bike. Ol bi terzê hozanyariyê dest bi gavên xwe dike, di rêka baweriyên re; Ol û hozanyarî di jyekê hev in, di gihiştina rastiye de. Ol rasteqîneyê dighîne mirov li ser bingeha

ku Xweda wisa gotiye û bi vî rengî ferman daye,



û hozanyarî rasteqîneyê radestî mirov dike li ser bingeha ku mejiyê mirov evan tiştan gotiye û peyda kiriye; Piştî ku li ser rasteqîneyê mijûl bûye û gellek lêkolîn û geryan kiriye. Ol ferman dide ku mirov li ser rasteqîneyên wê erê bike, ji ber ku ew rasteqîneyî jî gel Xweda hatiye nivsandin û bo mirovahiyê hatiye şandin, û hozanyarî li rasteqîneyê digere û gellek gumanan diçîne, da ku dighêje wan rasteqîneyan.

Hozanyarên Oldar Gihiştin Rastiyeke ew jî ev e:

Ol û hozanyarî her du hevî in, ji ber ku her du jî li rastiye digerin û dixwazin, tevî ku rêka wan bo gihiştina vê rastiye cud ye.

Dibêjin ku hozanyarî hildiperike bi asîmanan ve, ta bighêje rasteqîneyê, û ol ji ezmanan dibare!

Di encamê de, em dikarin bibêjin:

Hozanyar Pêxember in, û Pêxember jî Hozanyar in, tenê rêka gihiştina wan bo nasîna cuda û newekhev e, ji ber ku Hozanyar û Pêxember li ser yek rêyê ne, her du jî yek armancê dixwazin û hêvî dikin, Hozanyar li rastiye digere û Pêxember rastî li ser wî dibare û dadikeve. Lê rast e gelo wek ku dibêjin Hozanyar bê bawer û Xwedanenas e? Bo vê mijarê, bêayînî yan jî Xwedanenasî kêşeyek pirr kevn e, belkî ji her sê olên asîmanî jî kevintir be! Ev kêşe bi xwe baweriyek li cem hin mirovan çêkir, ku bingeha vê kêşeyê li ser nebûna Xwedayekî mezin û jîndar radibe û peyda

dibe, û hinek caran jî yê Xwedanenas dibînin ku Xweda heye, lê ne li gorî ku ol û pêxemberên cîhanê wî pesin dikin û dîmenên wî şîrove dikin. Pirraniya zanyaran, Xwedanenas in, ji ber ku ew hemû tiştên ku nas kirin û dîtin, tînin û li baweriyên xwe dipiş kinînin û lênerîna li wan dikin, û gava ku li baweriyên xwe dinêrin û hûrbînîyê dikin, wê demê dighêjin ku bingeha wan baweriyên tune ye, û ji rasteqîneyê gellekî dûr in! Xwedanenasî çawaniyeke bo her helwestek ji helwestên hiş mirov e, û ev çawanî erê nake ku sazmandekî asîmanî hebe, lewma jî bêjeya Xwedanenasîyê wek watedariyê bi vî rengî diyar dibe: Hebûna Xwedanekî nedîtî û berz ji gerdûnê re ew bêçare ye, û li ser vê bingehê, yê Xwedanenas bi neyinê li hebûna Xwedan dinêre, û wê hebûnê naçespîne, tenê bawerî bi hebûna Xwedan dimîne di baweriyê de, ya ku bê belge dimîne. Bawerîya bi Xwedan her mezin dibe û dijî, lê her tiştê ji mirov re ku bê belge be, bêguman em ê bikaribin wê erê nekin. "Gelo çawa gerdûna ku bi destê Xwedanekî heras çêbûye bi alozî û di rêya gellek kêmasî û qonaxan de, divê ku gerdûn jî wek sazkarê xwe heras bûba?" Di dawiyê de, dimîne kêşeya Xwedanenasîyê baweriyek paşsurîştî, û hozanyarî dimîne dergehê hûrbînî û lênerîna, pirraniya hozanyaran ne bi vê baweriyê ne, û hozanyarî dimîne ronaka herî rast û diyar, baştir e ku mirov bimîne li ser baweriyên xwe yê kûranî di tariya zanîn û fêrbûnê de.



LEŞKERÊN PAQIJİYÊ

Rodî Hemê

Tê gotin ku carekê li Japonê zarokêkî bi aliyê bavê xwe de bazda û got: Bavo, bavo wa xwedanê gemarê hatiye ji bo gemara xwe bibe, bav ji kurê xwe re got: Na kurê min na! Em xwedanê gemarê ne, lê ew hatiye qirêj a me pagij bike.

Bêguman ku em hinekî di wateya gotina bav de raman bibin, dibe ku em paş ustiyê xwe buxrînin, çiko ji berî teqnek sal ve û nerîna millet ji aliyê vî leşkerî ve bi pêş neketiye.

Paqijîkar, bi tenê navek ne dirust tê bikaranîn, û ew nav jî ji berhema rêjîma Ba'îs bû, navê "ZEBAL" ew navê ku ta di film û rêzefilmên xwe yên civakî de bikar tanin.

Li bajarê Amûdê ku tu di danê sibehê de li kolanan bigerî tê paqijîkaran li hemû deveran belavkirî bibîne, Fehed Îsmail Yûsiv, leşkerek ji wan leşkeran e, ku ji sala 2002 yan ve vî karî dike, û kolana ku tê de kar dike, dihêle ku mîna tabloyekê bê diyarkirin, dema ku xwe li kîsikên gelîşeyan daqûl dike, yan jî hin deverên gemar rêş dike, xwedan li ser eniyê ditevize û libên tozê xwe lê digirin, îcar tu dibînî ku dilopên xwedanê şêlo dibin û li serê bêvila wî tîna darvekirin.

Carinan çavên wî qayîşê bi tîrêjin rojê re dikişînin, lê mala minê pîrrê caran xwe ji vî qayîşê vedikişîne,

û berhemên serhişkiya xwe bi tûjbûna tîrêjên rojê re ji hêsirên çavan û xwêdana eniyê bi zendê xwe zuha dike, vedigere cengê û dişa piştta wan kolanan duxrîne ta ku kela nava xwe hênik bike, lê kesî ji we li rûkên wî neriye piştî bidawibûna wê cengê? Ew timî bi serdikeve, lewma ew kenekî bi her du lêvên xwe yên westiyayî li ser rûkên xwe nîgar dike, û di dilê xwe de ji gemarê re dibêje: Ta cengeke din Xwedê ji min û te re kerîm e.

Yûsiv dibêje: Ez pîrr ji karê xwe hez dikim, her wiha ez timî biser dikevim, di heman demê de ez ji zarokên xwe re dibêjim: Heger ku hinekan ji we pîrsî ku bavê we çî karî dike, hûnê bibêjin: Bavê me dihêle ku kolan bikenin û bajar rûgeş bibe, hûnê bibêjin bavê me kincên cejna remezan û qurbanê li kolanan dike.

Yûsiv rojane ji 7ê sibehê ve dest bi kar dike ta demjimêr 1ê piştî nîvro, bi torimbêla mezin re derdikeve, kolan bi kolan ew û hevkarên xwe digerin, bi tenê roja îne jê re navber e, lewma ew carinan bi westandinê hest dibe, lê di heman demê de dibêje ku ew xema westandinê naxw, bi tenê carinan gazinên welatiyan dilê wî dihêle û wiha dibêje: Carinan tu dibînî ku malekê telîsek mişt ax daniye ber derî! Û bi rastî tevî ku ji me nayê xwestin ku em vî cureyê ji gemarê bar bikin, lê em dadîqurtînin û dişa em bar dikin, lêbes

carinan telîsekî pîrr mezin tije ax dikin û dema ku em alîkariyê ji malbatê dixwazin ta em bar bikim, dibêjin: Ma karê we çî ye? Lewra dilê me ji wan dimîne.

Tevî hin pîrsgirêkan jî lê Yûsiv û hevkarên xwe karê xwe serkeftî bidawî dikin, her wiha ew timî li hêviya rojê ne ta ku bi erkê xwe rabin, min jê pîrsî

Heger ku gotina "Zebal" bandoreke neyênî li karê wî dike, wiha bersev da min:

Eger ku vî gotinê bandorên neyênî li kesayetiya min kirba, bêguman, ewê berdewamî di karê min de tune ba, lê tiştê li vî navê heye! Ji ber ku asta tîghîştîne negîhaye asteke pêşketî, lewma bandora vî paşketinê li tore û perwedeya malbatî dike ji ber vî yekê pîrrê caran zarokên min digrî dema ku zarokên dibistanê ji wan re dibêjin bavê we Zebal e, ev tenê min diêşîne, lê timî ez ji zarokên xwe re dibêjn ku bela serên we ji ber karê bavê we bilind bin.

Bi hatina demsala havînî re, nexweşiyên (ku dibe karkirên paqijîkirinê pêbîkevin) pîrr dibin, ji ber ku bi rastî şaredarî tu kincên taybet ji paqijîkaran re pêşkêş nekir ne ku wan ji nexweşiyên biparêzin, di heman demê de karkir jî pîrrê caran bîra encamên xerab ên ku ji rahiştina gemarê peyda dibin, nabin, lewma tu gellek caran wan bê lepik dibîn! Yan serserqot û dev vekirî

ne! Ev giş dibin sedema yekser ku veyrûs û bektîriya bi hesanî derbasî laşê karkiran bibin, ne bi tenê karkir lê malbatên wan jî endam in di vî xelekê de, û ta anuha kes li ser vî mijarê bi awakî berfireh ranewestiya ye, ji ber ku bi bilindbûna pileyên germahiyê re mikrob pîrr çalak dibin û tegera wan dehaq pîrr dibe, lewma pêwîstî bi dermanan heye. Ji berseva Yûsiv xuya dibe ku ew bîra pêzanînen bûrî nabe, dema min jê pîrsî hinekî bêdeng ma û li min nerî û keniya, weke ku ji min re bibêje: Ma ev tişt jî hene? Paşî wiha got: Bi rastî derman tune ne, lê hinek pereyên zêde didin me û em ji bo malbata xwe xeric dikdin.

Tevî ku 25,000 lêreyên sûrî bi kotekî meha wî derbas diken, tevî ku rojane 6 se'etan di nav gemarê de dema xwe diqedîne, û hêlên berpirisyar tu dermanan jê re pêşkêş nakin, ji bo wî ji nesaxiyên biparêzin, û tevî ku kesên kêman haybûn kêmaniyê bi dû karê wî dixin, û tevî gellek astengiyên din, lê ew dimîne leşkerek bêhempa, her wiha haybûna wî bi pêwîstî û giringiya karê wî, girêdana wî bi xaka welatê wî asêtir kir, di heman demê de ew li hêviya ku ji leşkerekî bêguhndan bibe leşkerekî navdar.



RÊYA TIRSÊ

Hisên Zêdo

di camên pencereya otombîlê re li tariya şevê dinere, û bi dehan ramanên bi tirs di hişê wî de diçin û tîn, carinan zû bala wî vedgere hundirê otombîlê, li lawê xwe yî birîndar dinere, û diponije; Ji ber ku neçar e biçê bajarê Şamê, di tariya şeveke çîle de û di rêyeke bi tirs re.

Dema otombîl hêdî dike lawê wî jê dipirse:

- Em gihştine ku derê?

-Şev tariye, bi rastî ez nizanîm, lê tiştê ji min ve xuyaye rêbendekî kontrolê ye, û ev rêbenda kê ye ez nizanîm, lê hema li gorî texmîna min Şam hîn gellekî dûr e. Bav vedigerand.

Otombîl radiweste, û seriyên nîvxewî û tewandî, bi hev re şiyar dibin û bilind dibin, ta ku nas bikin çî heye, û çavên tevayî siwaran ber bi deriyê otombîlê ve ye, her yek ji xwe dipirse gelo ev çekdar kî ne?

Çekdarek tev çeka xwe derbasî hundirê otombîlê dibe, û bi awirên tûj yek bi yek li siwaran û nasnameyên wan dinere, û wan dihmêre, çavê wî li lawikê birîndar dikeve lê jê re nabe xem, bang alîgirê ajokar dike û fermanekê radighîne.

"Di deh kêlikan de ji her siwarekî du hezaran berhev bike, ji çel û çar siwaran, ez heştê û heşt hezaran dixwazim, û kesê ku pereyan nede bela dakeve û bi meşê biçê Şamê".

Bavê lawikê birîndar ji yê çekdar dipirse:

-Ma yê pîr û kal û birîndar û nexweş jî wê pereyan biden...?

-Erê her kes wê pereyan bide û bela tu kes xwe ji ber erkê xwe yî neteweyî xwe nedî alî, ji ber em şerê rêcîma zalim dikin.

Lawikê birîndar bi dengê hêdî ji xwe re dibêje:

"Erkê neteweyî çî ye!"

-Dengê xwe meke ..Ew erkê neteweyî ye. Bav vedigerîne.

Bi lez alîgirê ajokar pereyan berhev dike, û dide destê yê çekdar, û biryara meşê digre.

Careke din otombîl dimeşe, û serî di tariya şevê de ditewin, hema yê birîndar û bavê wî tenê xewa wan nayê, ji ber ku tîye xwestin bi zûtîrîn dem bighêjin Şamê, û birîne derman bikin.

Piştî kêmtirî niv se'etê otombîl rastî rêbendekî din î kontrolê tê, û careke din radiweste, serî careke din ji xewê dicefilin, û çavên wan beloq dibin, û li aliyê deriyê otombîlê dinerin.

Li hev dinêrin wekî ku ji hev dipirsin, gelo vê carê kî ne! Û wê çî ji me bixwazin?

Çekdarek tevî çeka xwe derbasî hundirê otombîlê dibe, û fermana berzkirina nasnameyan dide.

Di kêlikê de her kes nasnameya xwe xiste destê xwe, û ma li hêviya yê çekdar.

Çekdar çar nasname di dest xwe de hiştin, dema gihşte bavê lawikê birîndar, li lawikê birîndar nerî lê jêr nebû xem, û bang li alîgirê ajokar kir û fermanek ragihand:

"Ev nasnameyên çar kesan e bela ji otombîlê dakeven, ji ber ku nasnameyên wan cihê gomanên e, dibe ew alîkarên terorîstan bin"

Bi lez her çar ji otombîlê daketin û bi yê çekdar re ketin danûsitendinê, ta her yekî ji wan du hezar pere dan, û dîsa li otombîlê siwar bûn.

Alîgirê ajokar biryara meşê girt, û otombîl careke din meşiya.

Otombîla ku berê wê ber bi bajarê Şamê de ye, heftdeh caran ti tariya şevê de rdiweste, û her carekê hin siwarên wê yên belengaz bi hin tawanan pereyan didin çekdaran. Berbanga sibeh careke otombîl radiweste, û di pîrbûna berfê de asê dibe.

Siwarên otombîlê li hev dinerin mîna ku ji hev re dibêjin, heta bi ezman jî naxwaze birîne xelkên Sûryayê derman bibe, heta bi ezmana jî dixwaze rêya Şamê bimîne tim û tim Rêya Tirsê.

Helbest: Îmad

Ebû Salih

RAZAYÎ

Çaxa ku şoreş dest pê kir ew razayî bû,

ji nav nivînên xwe derneket,

tevî ku wî bangên kuştinê

Ji pencereya ode ya xwe bihîst.

Pixand xewê,

bi tena xwe li malê bû

li taxê gişî,

ne qerebalixa firoşgeran

ne qêrîna zarokan

û ne ewtewta kuçikan.

Bi tena xwe

û azad,

ku şoreşger, di wê demê de, li wê derê

termê azadiyê oxir dikan.

XITYAR

Di qorzîkekê de bi ser hev de komkirîbû,

pêxwas

û kincên wî qetyayî

û xwîn ji devê wî tê,

xityarek lawaz

jixwe, qudûm pêv tune ye

Ku biçê destavê,

şoreş ew avête vê derê

da ku bi zorê bibe şoreşger.

Wergerandin ji erebî: Xoşman Qado

NERÎNEK DERIZÎ

Nûh Silêman

di neynika ku ji ser maseyê hatiye xwar

ez li rûyê xwe yî derizî dinerim,

nerînên xwe yî rast û teze

ez difroşim hemî aliyên rûyê xwe,

lê belkî ew jî derizî li min vedgerin,

û belkî hemî tişt di nijada xwe de

ji derizandinê çêbûne.

Ew ez im, ê ku li pişt min rawestiya ye,

piştî xwe daye dîwarekî derizî

û rûyê min î ku parçe parçe bûye, di cama pencereyê de,

li pişt min dide hev,

ez wî nabînim

lê ez zanim ku ew li pişt min e; ewê derizî.

Dibe ku gava bavê min û dêya min ji hev hez kirin

tiştê di hundirê wan de derizî bû,

dibe ku ew tişt ez im,

lewra bi peyala xwe yî derizî

ez gellek tiştên ku di hundirê min de derizîne, ez av didim,

lewra ku ejî

di hundirê gellek tiştan û gellek kesan de derizî me.

ALMODOVAR DERHÊNEREKÎ NAYÊ AVANYA ÇAVÊN TIJE HÊSIR Û MIROVÊN KELOGIRÎ

Şêro Hindê

Deriyên girtî yan asê dimînin, an jî bi rengêkî awarte û bi şaşî têne vekirin, deriyên sor, dîwarên sor, cilên sor û rengê erebeyan û alavên havîrdor sor in, an jî rengên gerim wek mijarên filiman bi xwe, kî vê xwînê bi ser dîwar û mirov û tiştan belav dike?

Di zaroktiya xwe de "Pedro Almodovar" ji aliyê bavê xwe tê şandin dibistaneke olî da ku bibe Qes. Lê xewnên wî ne li gorî vê pêşinyarê ne, û berê xwe dide dibistana sînemayê; lê deriyê vê dibistanê di rûyê wî de tê girtin.

Di nava alavên nexweşxaneyan de, bijîşk û şanogerên binavûdeng, pûşt, jin, û zilamên oldar de, bêjî û "aumo sexual" jî, hemû kesayetên Almodovar xwedî nerînen wêjeyî û hunerî ne, ta bi jinên pûşt di şanoya "Tenisi wilyamiz" de ji xwe re li rolekê digere; jinên pûşt wek rahîbe yan ne di civaka Almodovar de.

Çavên tije hêsir, mirovên kelogirî, civakên hestiyar û ciyewaz ên ku Almodovar bi jîrbûneke mezin ji nav wan çîrokên xwe lihev tîne, her kes bi çavên şil hestên xwe tîne ziman, poşmanî û lixwemikurbûn, her dem prisgirêkên sêksî yên ku wek mijarek balkêş di hemû filimên wî de têne xuyan, bitaybet "aumo sexual" û yên nêrûmê wek mirovên nerim û dilneya û xwedî nixên taybet û bi ser civakê de vekirî. Di filmê "All about my mother" de mirovê binavê "Alêgrado" zilamekî fizika xwe guhertiye û bûye nêrûmê, lê bi rengêkî awarte dibe akterekî şano, melodramakê pêşkêş dike

Piştî ku deriyê dibistana sînemayê hate girtin "Almodovar" xwest ku ji xwe re kamîreyakê bikire, lê ji ber ku destê wî teng bû berê xwe da dezgeha telefonê ya fermî û 12 salan di wî cihî de kar kir. Di wê demê de koma "Goliardos" ya şanoyê nas kir û tevî karê vê komê bû, û her wisa "Karmin Mawra" naskir, aktera ku em ê wê di gellek filimên wî de bibînin.

Girêdaneke pirr asê di çîrokên filimên "Almodovar" de peyda dibe, tevî ku gellek caran pêrgîbûnên ciyewaz, û ne li avaniya wek mercên hişk û bê felat her dem xuya dibin, lê hemû girêdanên çîrokên filimên wî bi rengêkî simbolîk û bi wateya xwe yî kûr derbas dibe, wek ku ji çîrokên Incilê ne, pêşveçûnên di filimên wî de nêzî serpê-

hatiyên dîrokî ne, lê dibe ku gellek caran dûrî şeweyê hesan be.

Di filmê (Volver) de yê ku di sala 2006 an de afirandiye, gundek bigîştî bawer dike ku jinek ji mirinê vegeheriya ye, û rastiya hinek bûyerên derbasbûyî ji wê jinê dixwazin, û ew jin jî wek wan tevî vê derewa mezin dibe û alîkariya qîzek xwe dike, di karê kiwafêrtiyê de, lê rastiya vê mijarê ew e ku şaşî di navbera laşê wê û yê yarıka mêrê wê de, yê ku di şewatekê de dimire, çêdibe.

Almodovar gellek sînyaro nivisandine, û gellek gotar û çîrok jî di kovarên çandî de belav kirine. Romanek kurt jî belav kiriye (Foago de mis inti-ranyasa), û filmê wî yê bi navê "Talk To Her" xelata Oskar a baştirîn sînyaroyê sînemayê di sala 2012an de stand. Di hemû filimên xwe de, Almodovar, dimenên nexweşxaneyan û alavên emeliyatan û nexweşiyên giran, wek Penceşêr û IDIS tîne ber çavan. Çandîna lebatan û guhertina fizikî, bitaybet, guhertina zayendê zilaman wek mijareke xuya, tê behskirin. Lê di filmê (The skin I live in) 2011an de, bi rengêkî berfireh vê mijarê şîrove dike. Wek her dem, zarokên bêjî û jinên pûşt û fobiyaya sex û bîranînen tevlihev, kesayetên gunehbar û kujer dide pêş. Filmê ku di festîval "Cannes" ê de beşdar bû, gengeşeyeke mezin li ser mijarên wî çêbû. Nemaze ku vê carê derhêner "Pedro Almodovar" gellek tundî, bi rengêkî ciyewaz û eşkere bikar anî. Ji ber ku ciwanekî xwest ku bi qîza textorekî re razê, û ji ber ku qîz fobiyaya seksî pê re hebû û nexweşiyên derûnî li dor wê peyda dibûn, keç ket rewşeke pirr xirab, û sezaya wî ciwanî jî li ser destê bavê keçê yê textorê nojdar, pirr bi êş pêk hat. Bav zayendê kurik guhert û gellek ezmûnên zanistî li ser çermê kurik an jî keçikê çêkirin, û piştî ku zayendê wî diguhere, Antonio Banderas, ê ku rola textor dilîze, pêrgî aloziyên zagonî tê, û ji dîv tolhildana wê keça ku li ser destên xwe, weke jina xwe ya ku hatibû şewitandin, afirandibû, tê kuştin. Hewaya vî filmî hinekî ji filmên wî yên din, cuda ye. Naveroka çîrokê jî ji romana nivîskarê



Fransî "Terry Jonkait" hatiye, û ev film yek ji wan filmên ku ji bo xelata zêrîn li festîvala "Cannes" ê, ketibû pêşbirkê.

Heger mirov bixwaze nêzikatiyekê di navbera hinek ji heyecan û diramatîk li cem "Almodovar" û "Hitchkok" peyda bike, yan jî gellek rengên din ji sînemaya "Hollywood" ê, wê ne şaş be. Lê ciyewaziyeke seyr li vir tê holê. Ji ber ku ev derhêner Ispanî yê, ku ji gundekî biçok û xizan hatiye, bê ku bi rengêkî akademî fêrî vî karî bibe, û bêyî ku saziyên prodiksiyonê yên mezin û maldar, piştî wî bigirin, dikaribû gellek gengeş û pirsgirêkên aloz biavêje nav gerînoka ramanên sînemaya Amerîkî û Ewropî. Seks û kesên hemzayend, dayik, girêdanên malbatî, hezkirin û durûtiya evîndaran, li hember zelalî û dilovaniya pûştan, bê fedî û bi wêrektî, laş û hest û sincan, tazî dike. Di filmê "Carne Tremula" 1997 de, "Viktor" di basekê de jidayik dibe, di dawiya film de jî, kirî kurê wî jî di teksiyeke de jidayik bûbûya. Mirovên ku di destpêka film de wek gunehkar û tund xuya dibin, hêdî hêdî xuya dibe ku ew

in ên dilovan, û dibin qurbanîyên şaşî û îxaneta kesên ku wek firîştan xuya dibûn. Tu carî Almodovar polîs an jî deshilatdar nade pêş, û gellek caran, wan nade xuyan jî. Lê cara ku polîsan dide xuyan, ew bi xwe dibin sedema alozî û ziyane. Girêdaneke pirr nazik û pêrgîbûnên li ber çavan, hezkirina ku di hevdişînekê de pêk tê, dibe sedema ku jiyana gellek mirovan him zelal û him tevlihev bike.

Kî dikare tola xwe bi kutanê hilîne? Ji bilî lehengên filimên Almodovar, ên ku ji sînyaro û cilûbergan, dîkor, listikvan û muzîkê û gellek caran ji gotinên stranên, jiyanekê tund û bi êş çêdike, lê ew gellek caran di hevdişînen xwe de jî vê nêrîne rexne dike, û xwe wek kurê deverê dide nasîn, devera ku hemû aloziyên civak û felsefeya jiyane û kêlikên awarte.

Almodovar xelata "Cannes" a baştirîn derhêner di sala 2002an de girt. Gellek xelatên din jî yên di sînyaro de yan jî derhênertiyê de girtin.

HANNAH ARENDT TUNDÛTIJIYÊ ŞIROVE DIKE

Cûdî Hac

Hannah Arendt di pirtûka xwe "di Tundûtijiyê" de, ya ku di bin siya cîhanek westyayî ku nû ji du şerên cîhanî derket, dibêje: "Ti kes bersiv li cem wî tune ye li ser pirsê ku girêdayî ye bi çawaniya dê emê bikaribin têkderiya giştî ji hundirê xwe bikşînin, di vê rewşê de".

Û ew bi vî tiştî dide xuyan ku pirsê li ser naveroka tundûtijiyê dikeve çarçoveya rewşek nepêşbîn, li vir pêwîst e ku ciyewazî bikeve navbera pirsên ku girêdayî bi warê tiştên ku bibin, û yên din bi warê neçariyê, û yên dîtir bi warê nepêşbîniyê ve. Lewra em tiştên (ku dibe bibin) em dikn, da ku bi derûdora xwe re rahatî bibin, û em neçariyê dixwazin da ku cîhanê biguherin, lê ti tiştî di barê nepêşbîniyê de li cem me tune ye ji bilî ku em jê matmayî bimînin.

Di vê pirtûkê de Arendt li ser tundûtijî û toreyê diaxiva, û dide xuyan ku ev her du tîgeh hestî xwezayî û mirovahî ne, ku ji enacama nebûna dadmendiyê ye. Berovajî tiştê ku li ser şaristanî û mirovahiyê hatiye belavkirin, ew gumana ku dibêje: "Tundûtijî ne mirovahî ye û bi rengekî pûwîstane cenawerî ye. Di çarçoveya vê hevokê de em dikarin li ser pirraniya bûyerên tundûtijiyê li dewletên

cîhanê yên curbecur rawestînin".

Arendt hemû nerînên berê di barê tundûtijiyê de ret dike, û di nerîna wê de ev kême û hatiye kurtkirin, ew jî ji ber hebûna pirsgerêkn Epistemology li pêşiya tîgihîştina me ji tundûtijî û mejiyê wê re, nemaze ew zanîna ku tundûtijî kir diyardeyek normal di civakê de. Her wisa Arendt tîgeha tundûtijiyê li cem Engels rexne dike, ku tenê wê mîna makîneya aboriyê dibîne, îcar tundûtijî bi vî awayî nema derbirîna xwezayîya dijminane yî nehestane ji mirov re, dike, ku jixwe nema kes dikare wê kontrol bike, lêbelê ew bercewendiyên aboriyane dide xuyan, ku tenê bo xweşbûnê û bidestxistna jêderên aboriyê, dixebitin.

Arendt xwe di ser dibistanên şirovekrina derûnî re dibîne, ji ber ew (nexasim Erich Fromm, şagirtê Sigmund Freud) tundûtijiyê tenê mîna tiştêkî surîştî dibînin, û Arendt tekez dike: "Berdewamiya hebûna cengê di nav me de îro, nayê wateya ku di dilê mirovan de hezkirinek bo mirinê heye, yan jî ji surîştekan wêran- kirane ku mirov nikare xwe jê rizgar bike".

Çaxa ku Arendt rêcîmên giştane

Hannah Arendt ON VIOLENCE

şirove dike, dibîne ku tundûtijî li dijî naveroka siyasetê ye, lêbelê wê tune û windayî dike. Dibêje: "Desthiladarî û tundûtijî li dij hev in, çaxa ku yek ji wan fermaneke bêsûnor bikeve destê wî de, yê din wî windayî be".

Tundûtijî li cem Arndtê pergalek civakî yî tebitî û veşartî ye, û di hundirê xwe de gellek şeweyên nakokiger ji rêxistinên civakane re, dicivîne. Lewra li seranserê dîrokê şeweyek an cureyek tenê ji tundûtijiyê re xuya nebû.

Hannah Arendt, bîryareke siyasî ye, ku li Almaniyayê di malbateke Cihû de, di sala 1906 an de, jidayik bûye, û di salal 1975 an de jiyana xwe jidest daye. Vê dawiyê hate tawanbarkirin ku ew dijî Samiyetê ye.

ZAROK JÎ PENABER IN

Nezîha Ebûzêd

Hemû lîstikên li taxê, kenên nazik, laşên bi kêf, diwestin. Hemû man mîna xewnan, bi destpêkek kin û dawiyek ne nas. Roj bi roj li kolanên bajarê Qamişlo Mihemed ê 12 salî, ku tevî xewnên xwe ji bajarê xwe koçber bû, dibe mîna nûnerekî ji desthilatdariya şerê ku li tevahiya welat belav bûye. Bi keserek kûr Mihemed dibêje: "Li bajarê Helebê bavê min karê bazirganiyê dikir, lê ji ber ku rewşa ewlehî pirr xerab bibû, û rojane navçeya me dihat bombebarankirin, me nedikarî karê xwe berdewam bikin; Da ku em bikaribin li vî bajarî bijîn, ez alîkarî û hevkarîyê bi bavê xwe û birayên xwe re dikim. Çimkî rewşa aborî jî pirr zehmet û dijwar bûye, û buhaya hemû pêdiviyên bilind bûye". Mihemed berdewam dike: "Ez kilînkêns difroşim. Her demekê karekî dikim". Bêguman pirraniya caran karê giran in. Û ne li gorî temen û wizeya Mihemed in. Lê ew neçar maye ku jiyaneke wisa zehmet bijî. Mihemed behsa dibistanê dike û dibêje: "Niha ez û birayên xwe naçin dibistanê. Em pirr xemgîn in ji bo vê yekê, li bajarê me beriya ku em birevin, dibistana me hate rûxandin, êdî em nikarin xwendina xwe temam bikin. Li vê

derê rewşa me ya aborî ne alîkar e ku em xwendina xwe li dibistanê berdewam bikin. Alîkariyên ku rêxistinên mirovahî ji koçberên mîna me re pêşkêş dikin, tenê têra xwarin û pêdiviyên me yê pêwîst dikin; Weke derman, çimkî dêya min rewşa wê ya tendurîstî pirr xirab bûye". Mihemed dema ku zarokan dibîne li taxê dilîzin çavên wî tije hêsiyê dibin. Zaroktiya wî hate dizîn, kêf, xewn û hêvî jî. Mihemed êdî nema di lîstikan de raman dibe, radîhêje barek giran li ser milên xwe û rojên xwe bi ked, girî û xemgînî derbas dike. Ew çî jiyaneke ji xwe re ava nake, hêviyên mezin ava dike, di mêjî û dilê xwe de bajarê xwe ava dike. Mihemed mijûl dibe, li ser hevalên xwe diaxive. Bi çavên melûl navên wan dihejmêre: "Ehmed hevalê min e, min ew li dibistanê nas kir. Me gellek caran bi hev re lîst. Lê beriya salekê di encama teqînekê de şehîd bû. Piştî wê bûyerê ez dilşikestî mam. Me nedixwest ku em ji bajarê xwe koçber bibin. Lê hatine me ji bo bajarê Qamişlo em ji mirinê parastin. Ji nava hemû parêzgehên Sûryayê rewşa Qamişlo ya baştirîn e, rewş li vê derê aram e. Ji ber karên giran ên ku Mihemed dike, gazinan ji êşên di laşê xwe de dike. Hêviyên

Mihemed bi vegera bajarê Helebê pirr mezin e. Mihemed û zarokên ku heman zehmetiyê dikşînin, şermek e di dîroka mirovahiyê de. Dîmenên karê zarokan dê di paşerojê de diyar bibin. Di rewşên şer de pirraniya zarokan kar dikin ji ber ku koçber dibin an jî ji ber ku rewşa aborî zehmet dibe. her wiha metirsî li ser tendurîstiya zarokan di paşerojê de gellek heye. Nexasim nexweşiyên fîzyolojîk. Zarokên ku neçar dimînin da kar bikin, bêguman ew nikarin bixwînin. Ev yek dibe sedema ku nîfşek nexwende çêbibe, êdî bandorek ne baş li tevahiya civakê bike. Mixabin nezaniya ku civaka me tê de dijî, rolekê di pêşketina vê pirsgerêkê de dilîze. Rêxistinên navdewletî hewl dan ku sînorekî ji belavbûna karê zarokan re deynin, lê ew hewldan bê encam bûn. Çimkî şer û pevçûn li gellek dewletan bê navber didom in. Û tarî û nezaniya ku civaka rojhilatê hêjî tê de dijî nehatiye bidawîkirin. Her dem nîfşê nû, bingeha civaka xwe ne, ew civakê ava dikin û hêviya jiyana baştirîn in. Êşa welatîyên Sûryayê berdewam dike, birçîbûn, koçberî, şiksetin. Qurbanîyên wan jî tim zarok in.





QETEK NANÊ HIŞK Ê GURZEK GUL BIDIN MIN

Xunav Kano

Mirovê ku du serdeman li ser milê xwe hildgire, û bi du mejîyan dirame, bi du zimanan diaxive, û bi du kesayetîyan ye; Gelo jin çawa du karên gewre bi hev re dike?

Jina ku li hundir damezirênera mala xwe ye, bi dilopên xwêdana xwe ava dike, û li derve pilinga ku li xwarin û jiyanê bo çêlikên xwe digere, heger em vê rûdawê li gor navçeya xwe -bi taybê li Rojavayê Kurdistanê- bipîvin, û em bi dîrokê re vegezin paş, em dê gellek jinên leheng bibînin, bi taybetî efsaneya Kurdî her dem bi Bêrîvanan xemilandî ye, dîrok destnîşan dike ku jin Dê û Bêrîvan e, hemû jinên karmend anuha Bêrîvan in.

Di 50 salên dawî de, û li herêma Cezîrê li Sûryayê, jin hêdî hêdî hewl dikir ku ji çarçoveya mala xwe derkeve, nemaze jinên ku nezewcîne her dem berê xwe didan xwendina xwe, û dûv re bi wê xwendinê kar dikirin, di destpêka şoreş a karê jinan de, nemaze roja cihanî ya jinê, rûpeleke nû di lînûsa jinên karker de vebû, di sala 1856 an de, dema hezarên jinan li Niyoyorkê li dijî mercên ne mirovahî di karê xwe de derketin, ew xwepêşandana ku hişt pirsigrêka jin a karmend bê

li ser maseya berpirsîyaran, lê di serhatiya navçeya Cezîrê de, bêhtirî jinên karmend mamosteyên dibistanan bûn, ji aliyekî ve asteke bilind e ku jin mamoste be, û ji aliyekî din ve civak ew dipejirand ji ber alîkariya diravî, tekezkirina vê gotinê ew e ku ji yekemîn mamosteyên jin li Sûryayê birêz Rewşen Bedirxan bû, eger weke çavdêr em roniyê ji qorzîkekê bidin rewşa jin a karmend li Cezîrê, bi kêmanî di deh salên dawî de, wê diyar bibe ku jin li vê navçeyê li Sûryayê bi rengekî karêger derbasî xêza karkirinê bûye. Gellek karên derve dikir weke: Pijîşkî, Mamosteyî,

Rojnamegerî, Parêzerî, Cotkarî, û gellek karên din ku mercin wan ên taybet hene.

Bi çavê civaka Rojhilat, jinê mafê xwe di kar de stendiye, lê heger em weke jin li vê rûdawê binêrin, em ê bibînin ku hîn gellek gav hene -di vê rêyê de- divê jin biavêjin. Weke minak çima jin nikare ajokar be? Çima nikare karkera paqijkirin a kolanê be? Çima nikare firoşkar be? Her wisa çima nikare karkera avahiyê be?

Û gellek karên normal li her deverê, berî demekê di raporeke televiziyonê de hat xuyakirin, ku jinek

ji Xeza ya Filistinê ji xizaniyê neçar bû ku bibe hesinkar!

Ew jina ku bi zarokên xwe re li kolanê dijî, bi zehmetî vî erkî dike, û tevî vê êşê ew tekez dike ku divê zarokên wê bixwînin ji ber di nerîna wê de xwendin bingeha jiyanê ye.

Di nerîna min de sedem ew e ku hîn civak û jin ji mêrê Rojhilat ditirse, hîn civak negahiştîye asta ku bi armanca xwe û bi zelalî birame, dema ez bixwazim kar bikim divê bi bav, bira, cîran û civakê biramim, ji ber wilo her dem dê karê min qels be.

Her wiha kar dihêlê raman azad bibe, û armançek ji hebûnê re bê dayîn, lê pirsigrêk ew e ku pirra-niya jinan li nîrxê diravî dinerin, berî ku li avakirina kesayetiyê bi saya kar, bibînin. Weke nimûne gellek jin dema diçin zanîngehan bi paşerojê diramin, paşeroja ku tê de mûçeyên xwe bistînin, her wiha bilindkirina asta mêr ango "zave", ji ber mercên gellek malbatan e, dema li bûkekê (ji lawê xwe re digerin) merc e ku jin an "bûk" xwende be, ji bo ku bikaribe alîkariya hevserê xwe di aliyê diravî de bike, û di heman demê de hin malbat hene mercê wan ku jin nexwende be, bo ku weke

dibêjin "zimanê wê kin be û serê mêrê xwe neêşîne".

Xaleke din heye ku her kareke jinê bandorê li wê dike, bi rengekî din jina ku di karê xwe de rêvebir be bandor li mala wê jî dibe, her wiha ramanê wê her dem li ser rêvebiriya wê dimîne, li herêma Cezîrê û piştî avakirina Rêvebiriya Xwaser ya Demokrat tiştê tê diyarkirin pergala hevserokatiyê ye, her tişt bi du serokan e jin û mêr e, ta bi serokatiya kantonê jî hevpar e, her wiha zagonên jinê di rêvebiriya de, tiştê bala min dikşîne ew e ku gellek jin bê psporî û zanebûn bûn rêvebir û karmend û li vir dîsa jî jin dibe tabloya xemilandinê, ji ber nabe jinek nexwende li dadgehan bibe parêzer, an jineke bê pênûs bibe rojnamevan, jinek bê derman pijîşkiyê bike.

Şoreşa Sûryayê karê jinê bêhtir û zehmetir kir, û hişt hêdî hêdî nerîna civakê jê re bê guhertin, nemaze hîn karên nû ku jin li Sûryayê dike, ta bi karê hawarcûnê, leşkeriyê, û gellek karên din ku civak berî şoreşê li dijî wê radiwestiya, anuha rêya karkirina jinê piçekî vebûye, û ew sînorê ku di navbera jinê û kolanê de ava bibû tê hilwişandin.

Zagonên kantona Cezîrê yên jinê wekheviyê di navbera jin û mêr de çêdike, nexasim wekheviya



di mafê kar de, bi renekî din dema tu li kolanên Qamişloyê bimeşî û tu Polîsên Jin ên Trafîkê bibînî, nameyek ji bo paşerojê diyar dibe, di nerîna min de piştî çend salan emê bibînî ku jin li navçeya me dê bibe ajokar û dê bibe karkerek normal li nanpêjgehan jî!

Ev ji aliyê rêvebiriyê ve, lê ji aliyê din (aliyê civakî ve) jina ku ji sibehê ve kar dike û her dem bi karê xwe mijûl e, di dawiya roja xwe de dema vedgere mala xwe, xelkê malê dest bi daxistina moralê wê dikin, dema jin bighêje asta hezkirinê bi karê xwe re, û li hêviya çirûskê biçûk be, ta ku agirê serkeftina xwe vêxe, civaka derdora wê dibe ava sar a ku wî agirî vedimrîne, nemaze rewşa jina nezewcî û hîn kar dike, nizane kar ji jiyana taybet di civakê de cuda bike.

Her wiha ta bi karê ne baş, ango, rêxistinên ku karin ne baş li vê herêmê dikin, dema li wan rêxistinên tê nerîn, li ser mêrên wan dibêjin ku ew diz in, lê jinên wan bi "bê şeref" tînin binavkirin, ev tişt ji ber ku hîn dema li karmendan tînin nerîn, bi çavê biçûk li jina karmendên tê nerîn, her wiha rêvebirê karê ku pîrîniya caran mêr e, dema karmenê wî jin be bi çavê guran lê dinêre, weke ku jê re dibêje her tiştê te ji min re ye, ji ber ez rêvebirê te me!

Dema jin diçe zanîgehê û xwendina xwe bidawî dike, jinên hawîrdora wê jê re dibêjin:

"Keçê bixwîne ji bo tu bi hewcedarî mêr nebî, ji bo tu Azad bî"

Di nerîna wan jinan de ku azadiya wan bi azadiya bêrika wan ve girêdayî ye, û ev tişt ji zarotiyê ve di mejiyê keçan de hat çandin; Azadiya rasteqîne li dijî mêr e!

Jina Dê ya ku kar dike -hîn neçar e- karê xwe li malê weke ku ne karmend e bike, û dema hevserê wê li civatan rûdine dibêje:

"Ez mêrekî azad im, û azadiyê didim jina xwe jî"

Azadiya ku bê dan ne azadî ye, mirov azadiya xwe bi dest dixê, ne kes dide wî, her wiha lêkolîn diyar dikin mala ku Dê di wan de karker be, bi hêztir e ji aliyê rêxistinê, perwerdê, xwendin û serxwebûniyê ve.

Karê jinê zanîna wê ye, da ku hestên xwe yê xirab bikûje, û ji dêvla kesayetiyeke qels (ku bi laşê wê ve girêdayî ye) kar dibe kesayetiya wê, ya ku bi mejî û ramana xwe jineke azad diafirîne, û ew e, ya hêjayî ye, ku qetîk nanê hişk û gurzeke gul diyarî wê bibe.